

# Bazinê Nînattayê



Ahmet Ümit

Wergêr: Rêşad Sorgul



**BAZINÊ NÎNATTAYÊ**  
**Ahmet Ümit**

**Wergêr: Rêşad Sorgul**

BAZINÊ NÎNATTAYÊ  
Ahmet Ümit  
Weşanên Mezopotamyayê

Çapa yekemin: Adar 2008  
Wergêr: Rêşad Sorgul  
Redeksiyon:  
Mîrhem Yîgît  
Avesta Aydın  
Luqman Guldivê  
Diyar Bohtî

ISBN: 3-885965-6-98

Herausberger:  
Mezopotamien Verlag und Vertriebs GmbH  
Gladbacher Str. 407 B  
41460 Neuss/Deutschland  
Tel: +49 213 14069093  
Fax: +49 213 14029562  
[www.pirtuk.com](http://www.pirtuk.com)

*Bazan*

**BAZINÊ NÎNATTAYÊ**  
**Ahmet Ümit**

**Wergêr: Rêşad Sorgul**

**BAZINÊ NÎNATTAYÊ**  
**Ahmet Ümit**

**Wergêr: Rêşad Sorgul**

# KEVALA YEKEMÎN





Tu bi xêr hatî rêwiyo! ji riyên dûr,  
mizgîngîhanê nûçe û xeberên xweş,  
westa zanîna bi salan li ser milên te,  
tu, kesê di çavên xwe de heyecana sirrê hildigire,  
tu bi xêr hatî welatê min ê xweş Hattûşayê,  
ser axa Hattiyan a xwedî hezar Xwedayan,  
welatê min ê pîrbûyî û qedîm...

Tu bi xêr hatî bexteweriya nexweşketî,  
kedera min a temendirêj û şîna min a tu yê bi dawî bikî.  
Tu bi xêr hatî kolanên sêwî, meydanên bê xwedî,  
mala min a stûxwar.

Ez li benda te bûm.  
şevên dirêj, tevahiya rojên dirêj,  
biharên şên,  
havînen tertiî,  
payîzen westiyayî,  
tevahiya zivistanên dijwar,  
salên gelek dûvûdirêj.  
Tu bi xêr hatî.

Li ser van erdan çend şer qewimîn, çend talan,  
 çend şah û keya li text rûniştin, çend melîk ji hukim ketin,  
 çend mirov mirin, çend mirov hatin dinê,  
 çend îxanet, çend eşq,  
 çend cejin, çend ayîn,  
 çend bênder rabûn, çend dawet çêbûn.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya ku Xweda me li Qadeşê bi gunehê herî mezin û xeter-  
 nak ê rûyê erdê bi şer ceza bikin.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya ku Xweda mirinê bi welatê min re bikin heval.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya şerê herî mezin ê li rûyê erdê hînê dest pê nekiribû.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya ku eşqa min a bi tenê Nûvanza neçûbû Qadeşê.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya ku Nûvanzayê mêrxas li erda Qadeşê wenda nebûbû.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya şîn rûyê pîrejînan bi rondikên çavan bişon;  
 mirin porên bûkên ciwan bê wext sipî bike,  
 şer mîna ewrekî reş û tarî xwe berde ser lîstikên zarokan.  
 Ez li benda te bûm,  
 beriya Şah Mûvatallî fermana şer bide.  
 Hattûşa hê nehatibû valakirin,  
 Fîrewnê Misrê Ramses bi ser Qadeşê de nemeşiyabû,  
 bedenên eskeran ên ciwan û teze li meydanên şer neriziyabûn.  
 Ez li benda te bûm,  
 bêyî ku bizanibim tu kî yî,  
 lê min weke navê xwe baş dizanîbû tu yê wezîfeya xwe  
 pêk bîni.  
 Ez li benda te bûm,  
 ji te piştrast bûm,  
 bêyî ku meraq bikim tu kî yî.  
 Ez li benda te bûm,


ji bo hesreta min a hezar salan bikewînî.  
Ez li benda te bûm,  
ji bo tu kilama min a nîvcomayî tamam bikî.  
Ez li benda te bûm,  
ji bo tu ruhê min û eşqa min a bi tenê mêrxas Nûvanza bigi-  
hînî hevdu.  
Ez li benda te bûm,  
ji bo tu alîkariya min bikî.  
Ez li benda te bûm,  
ji bo baweriya min a bi Xwedayan neqede.  
Ez li benda te bûm,  
ji bo ez xwe, pêşiyên xwe yên ji zuriyeta Şah Tabarna,  
ji bo bedewiya xwe ya wextekê mîna hemtayê Xwedawen-  
da Heyvê,  
ji bo xwe Nînatayê ji bîr nekim.  
Tu bi xêr hatî...

Ez dizanim ku gotinên tu bibihîsî wê hişê te tevlîhev bikin,  
ez dizanim ku çavên te ji tiştên dibînin wê bawer nekin.  
Nebî nebî tu matmayî nemînî,  
nebî nebî tu ji riya xwe venegerî.  
Nebî nebî, min mîna sûretekî pûç ê di tariyê de nefikirî.  
Ez keça Marûvaşê esilzade yê endamê civata Pankûyê,  
jina bêbext a fermandarê mêrxas Nûvanza, Nînatta me.  
Ez li benda te bûm.  
ji ber ku beriya Nûvanzayê esilzade ber bi Qadeşê bikeve rê,  
beriya ku di nava şer de wenda bibe,  
qala hatina te kiribû.  
Ez li benda te bûm,  
ji ber ku Nûvanzayê fêris ev yek ji min re gotibû.  
ji ber ku Nûvanze ev yek ji Xwedayê Rojê yê Ezmên bihîstibû.  
Ez li benda te bûm,  
ji ber ku di xewê de,  
Parêzvana Min Xwedawenda Rojê ya Arînnayê ji min re got.

Nûvanza yê mêrxas li ser devê Xwedayê Rojê yê Ezmên  
 û Xwedawenda Rojê ya Arînnayê ji min re got;  
 kesê te bigihîne şadî û bexteweriyê,  
 wê ji demekê bê, ji salan wêdetire.  
 Ew ê bibe mirovê vê axa ku bi sêhra demê re bûye welatekî  
 biyanî.  
 Ew ê kesekî wisa be, wê ji nav şerên mezin hatibe.  
 Ew ê ji nav êşên kûr,  
 ji nav kederên mezin ên ketine ser hevdu,  
 ji nav rondikên çavan ên mîna lehiyan diherikin hatibe.  
 Ew ê bê û nivîsên te bixwîne.  
 Ew ê bê û te fêhm bike.  
 Ew ê bê û laneta li ser te rake,  
 Ew ê bê û te bigihîne Nûvanzayê esilzade.  
 Ji wî re bi destûra Xwedayê Rojê yê Ezmên  
 û Xwedawenda Rojê ya Arînnayê qala duwanzdeh bazinên  
 Nûvanzayê mêrxas dane çêkirin bike.  
 Jêre bêje:  
 Ji wan bazinan tenê yê pêşî bi min re ye.  
 Yên din her yek ji wan li bajarekî cuda ye,  
 li cihên cuda binaxkirî ne.  
 Ji wî re bêje:  
 Tu, biçê wan bajaran.  
 Tu, wan bazinan berhev bike.  
 Ji wî re bêje:  
 Li ser her bazinî nivîsiye ka bazinê din li kîjan deverê ye.  
 Ji wî re bêje:  
 Eger tu wan bazinan berhev bikî,  
 wê evîndarê min ê bi tenê, zîlamê min ê xurt,  
 Nûvanzayê mêrxas li min vegere.  
 Ji wî re bêje:  
 Ev ne daxwaza min e, ya Xwedayan e.  
 Bicihanîna xwesteka xwedayan;  
 bi qasî avdana zeviyekî tî baş e,

bi qasî têrkirina birçiyekî qencî ye,  
bi qasî anîna cem hev a du evîndaran bextewerî ye.  
Ji wî re bêje:  
Bicihneanîna daxwazên Xwedeyan,  
bi qasî tî hiştina zeviyan,  
bi qasî birçî hiştina xizanan,  
bi qasî piştzivîrandin û rûbadana li evîndarê xirab e.  
Eger tu pişta xwe bidî evîndarê,  
Xwedayê jî pişta xwe bidin te,  
û wê te di nava lanetê de noq bikin.  
Ji wî re bêje:  
Tu min bigihîne Nûvanzayê mêrxas,  
ez ê jî temenekî bextewer û xweşbextane ji bo te bixwazim.  
Ji ber ku xwestekên evîndaran qebûl dibin.

# KEVALA DUYEMÎN





Hooo! ew kesê ji heyamên ez nizanim tê.  
Hooo! ew kesê ji bo vê laneta mezin rake,  
ku min di nav penç û lepên xwe de dihilhilîne, dinalîne,  
ji nav welat û bajarên nizanim tê.  
Tu êdî yek ji kesên malbata min î.  
Tu birayê min ê heq î,  
tu mîna zarokê min ê hîç newelidî yî.  
Ji ber ku te ji gotinên Nînattayê bawer kir,  
te xwendina nivîsên wê dewam kir.  
Madem ku te biryar da êşa wê bikewînî,  
madem ku te destê alîkariyê yê mehder û şefqetê dirêj kir,  
êdî mafê te heye tu bizanibî çi diqewime.  
Tu yê serhatiyên Nînattayê,  
bûyerên çaxa Şah Mûvatallî û Şah Hattûşalî,  
yên li welatê Hattî yê hezar xwedayan qewimîne hîn bibî,  
tu yê meraqa xwe bişkînî.  
Tu yê xweziya Fîrewn Ramses hîn bibî,  
tu yê meraqa xwe bişkînî.  
Evîna mezin a Nînattayê ji bo Nûvanza,  
bela û bobelatên bi serê me de hatine,  
jiyanên me tefandine, bêyî ku em bixwazin,  
Xwedayên zalim ên hewldane me bi lanetan ji hev biqetînin  
tu yê nas bikî,  
tu yê meraqa xwe bişkînî.

Lê bisekine, raweste, nelezîne.  
Bi sebir be,  
mîna roja ku beriya li qotên çiyana xuya bike,  
li benda yek bi yek tefandina stêrkan e.  
Her gotina, min bi bûyernivîsa xwe ya dilsoz daye nivîsandin  
bi baldarî bixwîne.  
Bi baldarî û bi dengekî bilind bixwîne.  
Deng bibihîse û maneyê his bike.  
Ez ê jî, mîna heyva li benda hilatinê ye, bi sebir, her gotinê  
bifikirim, hilbijêrim û binivîsînim.  
Ji bo ez dest bi çîroka xwe bikim,  
ji bo ez gotina xwe ya destpêkê bibînim,  
ez ê qet zehmetiyê nekişînim.  
Ji ber ku ew gotina ez her roj wê dinihurînim,  
va ye, ji ber xwe ji devê min, ji ser lêvên min tê xwarê:  
Nûvanza.

Ez ê pêşî ji te re behsa Nûvanza bikim.  
Eger Nûvanza nebûya,  
ne roja hiltê, ne barana dibare,  
ne tov, ne ax, ne dara ber dide,  
ne jî Hattûşaya bedew maneya xwe hebûn.  
Eger Nûvanza nebûya,  
bûk nedibû bûk, zava nedibû zava.  
Melîk ê ji melîktiya xwe bibûya, melîke yê nebûya melîke.  
Eger Nûvanza nebûya,  
xwîna di damarên min de wê neherikiya,  
kulîlk ê nepişkiviyana,  
mûcîze û derhozeyê bibûya rastiyeke tamsarkî,  
heyecanê fena kulîlkeke tîmayî ji nişkê ve biçilmisiya.  
Ez ê ji te re qala Nûvanza bikim.  
Mêrê min ê esilzade, rohnîya çavên min, taqeta çongên min,  
hêviya dilê min, sirrdarê çermê min, evîna min a bi tenê  
Nûvanza.

Wexta min Nûvanza dît,  
 min ew berê jî dîtibû,  
 lê cara pêşî min ew dît, kêliya min jê hez kiribû.  
 Çaxa min Nûvanza dît ez piçûk bûm,  
 piçûk bûm, ji Hattûşayê, ji mêran,  
 ez ji xwe hay nebûm keçikeke piçûk bûm.  
 Min ew dît,  
 min destpêkir mêr naskirin.  
 Min ew dît,  
 min destpêkir xwe nas kir.  
 Min ew dît,  
 min destpêkir jiyana nas kir.  
 Min ew dît û xwest.  
 Min ti tişt ewqasî pir nexwest.  
 Min ji tiştên xwestibûn ji tiyan ewqas hez nekiribû.  
 Min ew dît, min jê hez kir, min ew xwest.  
 Min cara pêşî ew li baxçeyê mêwan dît.  
 Li nava baxçe darên mezin hebûn,  
 mêweyên stewiyayî bi guliyên daran ve hebûn.  
 guliyên daran di bin mêwan de tewiyayî bûn.  
 Ez li baxçe bûm.  
 Li cem min, hevalê min ê zarokatiyê Înara yê bextreş hebû,  
 ew kurê serkatibê qesrê Zûvappîşê esilzade bû.  
 Ez li baxçe bûm.  
 haya min ji min tinebû.  
 Li baxçe lîstik hebû. Baxçe şên û şeng bû.  
 Nûvanza hat wî baxçeyî.  
 bi bavê min ê esilzade Marûvaş re,  
 bi jina xwe Mannî re hat.  
 Nûvanza wê wextê bi Mannî re zewicîbû.  
 Lê hezkirina min ewçend mezin bû, min ew dîsa jî xwest.  
 Haya wî ji min tinebû.  
 Haya wî ji hezkirina min tinebû.  
 Lê min dizanîbû:

Wê ez bidîtama,  
Wê ji min hezbikira,  
Wê ez bixwestama.

Nûvanza wê wextê ciwan bû.  
Çavên wî mîna çavên bazan dijwar bûn.  
Bedena wî mîna conegayên Xwedayê Firtonê bi hêz bû.  
Mîna şêrên Xwedawenda Rojê ya Arînnayê jêhatî bû.  
Nûvanza di temenê xwe yê ciwan de tevî gelek şeran bûbû.  
Bi eskerên Kaşgayê re yên êrîş anîbûn ser Hattûşayê şer kiribû.  
Cerdevanên welatê Palayê şikandibûn.  
Nûvanza lehengek bû,  
Nûvanza destanek bû,  
Nûvanza çîvanokek bû,  
Nûvanza ew mêr bû min jê hez dikir.  
Mirovan xwe jê dûr digirt,  
ji ber ku ew şervanekî baş bû.  
Mirov ji Nûvanza re bi hurmet bûn,  
ji ber ku ew kesekî durust bû.  
Min xwe ji Nûvanza dûr nedigirt,  
ez weke yên din ji Nûvanza re bi hurmet jî nebûm,  
ji ber ku min ji wî hez dikir.  
Hezkirina min ji hurmetê, ji tirs û fikarê jî mezintir bû,  
hezkirina min hînê xurtir û bi hêz bû.

Ez wexta Nûvanza tînim bîra xwe tim girnijînek tê hişê min:  
girnijîneke wêrek, tije hêvî, hinekî bi yarî  
lê kenekî ji xwe û ji dinyayê piştrast bû.  
Wexta min Nûvanza li baxçeyê mêweyan dît,  
dîsa bi heman rûkenî û girnijînê bû.  
Li cem wî bavê min ê esilzade Marûvaş hebû,  
li cem wî jina wî ya xweşik Mannî hebû,  
û ew rûkenî û girnijîn li ser Nûvanza bû ku ew pê dibû  
Nûvanza.

Ez li ser guliyekî dara hejîrê bûm,  
min bi hevalê xwe yê zarokatiyê Înara yê bextreş re dilîst,  
û ew kurê sernivîskarê qesrê yê Zûvappîşê esilzade bû.  
Înara mîna golên sekan zarokekî bêdeng bû,  
ez bi qasî şîpeke har bi coş bûm.  
Înara li ber min digeriya, lavahî li min dikirin,  
ji bo ez ji dara hejîrê daketima,  
ez serhişk û bi rik bûm,  
ez danediketim.

Ha min di wê wextê de Nûvanza dît,  
Ha min di wê kêliyê de rûkenî û girnijîna Nûvanza dît.  
Wê girnijîna wî ez zevt kirim,  
ez ji dara hejîrê daxistim.  
Ez zevt kirim, daxistim û kirim keçeke ciwan a xama.  
Ez ji zarokatiyê rizgar kirim,  
mizgîniya jintiyê da min.

Wexta min Nûvanza dît,  
min çarenûsa xwe mîna masiyên di aveke zelal de dilîzin dît.  
Wexta min Nûvanza dît,  
min fêhmkir ku wê jiyaneke bêyî wî nebe.  
Herçî Nûvanza bû ku gelekî ji min bi emirtir bû,  
Nûvanza hevalê bavê min bû,  
jina Nûvanza hebû,  
jina Nûvanza bi kurê xwe yê piştî sê mehan bianiya ducanî bû.  
Lê rûkenî û girnijîna Nûvanza digot hîç netirse,  
yên tu dibînî demborî ne,  
tenê tu û hezkirina te ji bo min heqîqet e.  
Û min ji rûkenî û girnijîna wî bawer kir,  
û min ji wî hez kir.  
Û ez heta hetayê li benda wî mam.

# KEVALA SÊYEMÎN





Hooo! Mirovê ku Xwedayê Rojê yê Ezmên,  
Xwedawenda Rojê ya Arînnayê mizgînkirî.  
Ho! ew kesê evîna min a bi tenê Nûvanza behsa hatina wî kirî.  
Destên min bi hurmet, bi hezkirin û minnetdarî dirêjî te dibin.  
Ez ji dil malavahiya te dikim, spasdariyeke rast pêşkêş dikim,  
ji kerema xwe re qebûl bike.  
Ji ber ku te ev keval xwendin,  
ji ber ku te ji min bawer kir,  
ji ber ku tu derketî vê rêwîtiya pîroz,  
ji ber ku te xwe da ber fermana Xwedeyan.  
Xwestekên baş ên vê jina çarenûsa wê tamam nebûyî,  
vî ruhê nearam,  
vê evîndara negihîştiye miradê xwe qebûl bike.

Dibe ku tu li ser riyan bî.  
Ma jixwe jiyan ne rêwîtiyek e?  
Ma jiyan, ji bilî meşeke li ser rêşivaneke Xwedeyan bi bûye-  
ran deribandiye pêve çiyê?  
Wexta tu li ser riya Xwedeyan bimeşî,  
ez ê jî çîroka xwe ji te re vebêjim.

Ji bo tu bêzar nebî,  
ez ê çîroka xwe bikim hevalê te.

Ho! ew kesê ji salan wêdetir ji demekê tê,  
Ha ez carek din wê gotina mîna gezo bi lêvên min dizeliqe  
dibêjim:

‘Nûvanza’

Min Nûvanza dixwest.

Simbil çawa rojê, mêşa hingiv kulîlkê, zarok diya xwe,  
zevî tovan, mêr jinê çawa bixwaze,  
min jî Nûvanza weha dixwest.

Lê haya Nûvanza ji vê nebû.

Ez li her devera Hattûşayê li wî digeriyam.

Çavên min li sûretê wî, guhên min li dengê wî,  
bêvila min li bêhna wî digeriya.

Lê wexta min ew didît, ez jê direviyam, min xwe jê vedidiziya,  
min xwe li cihekî tenha digirt.

Min ji wî cihê tenha têra xwe lê temaşê dikir.

Ez nediçûm cem wî,

eger ez biçûma cem wî,

ez ditirsiyam sêhra sipî ya Xwedeyan xera bibûya.

Eger ez biçûma cem wî,

min digot:

wê min weke her keçekê bibîne,

wê ez wisa nas bikirama, wisa bizanîbûya, wisa hînbûya.

Ji cihê tenha,

min li bîra vexwarina wî,

li awir vedana wî, li henekên wî temaşê dikir.

Min li dengê wî yê bilind, lê bi mehder guhdarî dikir.

Wexta min xwe venedidiziya û wî ez didîtim,

min tenê li wî mêze dikir.

Di wê kêliyê de, nertin bi serê xwe dibûn mirovek,

min nikarîbû ji awirên xwe re tiştêkî bibêjim,

nertinên min çawa dixwestin welê li Nûvanza mêze dikirin.

Nûvanza ji nertinên min fêhm nedikir.  
Dixwest fêhm bike, lê fêhm nedikir.  
Belkî dixwest bi min re bipeyive, lê fêhm nedikir.  
Ez ditirsiyam ev sêhr xera bibe, ez direviyam.

Erê, welê, ey kesê wê çarenûsa min a reş biguhere,  
roj wisa buhurîn.

Jina Nûvanza Mannî jêre zarokek anî dinê.  
Rûyekî mîna heyvê yê zarok hebû, min ew dît.  
Porekî reş ê zarok hebû, min ew dît.  
Çavên teyisokî yê zarok hebûn, min ew dîtîn.  
Zarokekî pir xweşik bû, min ew dît.  
Min çavnebarî nekir. Ne ji wî û ne jî ji diya wî Manniyê.  
Ez şa bûm; ji ber ku Nûvanza jî şa bûbû.  
Nûvanza li kurê xwe navê Şah Mûvatallî danî.  
Navê Zîtîş lê danî.  
Min çavnebarî nekir.  
Min weke Zîtîş anîbe dinê pê şa bûm.  
Min ji Zîtîş hez kir. Zîtîş bi ziman ket, min çavnebarî nekir.  
Zîtîş bi firrê ket, meşiya, min çavnebarî nekir.  
Zîtîş bi zarokên din re lîst, min çavnebarî nekir.  
Diya wî ew li kolanê ji bîr kir, min ew ji bîr nekir.  
Min ew ji bela û tehlûkeyan parast.  
Min ew ji xwîna xwe qebûl kir.  
Min ew weke kurê xwe pejirand.  
Min ji wî hez kir. Ji ber ku Nûvanza jî jê hez dikir.  
Ez şa bûm; ji ber ku Nûvanza jî şa bû.

Pir neajot.

Ji ber ku karên Şah Mûvatallî hebûn.  
Ji ber ku karên Mûvatallî,  
ji bexteweriya Nûvanza girîngtir bûn.  
Nûvanza, ne tenê fermandarê Şah Mûvatallî bû.  
Hevalê wî bû, sirrdarê wî bû, ewlekariya wî bû.

Wexta Mûvatallî diket tengasiyê, Nûvanza jî diket tengasiyê.  
Nûvanza bi fikar bû; ji ber ku Mûvatallî jî bi fikar bû.  
Ez bi fikar bûm; ji ber ku Nûvanza bi fikar bû.

Dijminên Mûvatallî pîrr bûn.  
Li jor Kaşgayî, li jêr Misrî.  
Kaşgayî mîna beraza bûn nedihatî zevtê.  
Êrîş dianîn ser erdên me,  
mal, bax û baxçeyên me talan dikirin.  
Bi alîkariya Xwedayê Rojê yê Ezmên  
û parêzvana min Xwedawenda Rojê ya Arîna,  
Nûvanzayê mêrxas,  
tevî birayê şah, serwerê artêşa mezin, Hattûşîlî,  
Kaşgayî têkçûn.  
Kaşgayîyan li ber şûr û bivirê Hîtîtiyan stû tewandin.  
Fîrewnê Misrê Sethos di êrîşên bir ser Qadeşê de têkçû.  
Şervanên Hîtîtiyan li Heleb û Kargamêşê,  
artêşa wî ya xwînrij poşman kirin.  
Fîrewn Sethos têkçûna xwe mîna têrreke bi pîne hilgirt,  
di nava şermê de neçar li welatê xwe vegeriya.  
Dijminên li hawîrdora Hattiyê bêdeng bûn,  
tepisîn, xwe vekişandin kozikên xwe.  
Herçî tengasiya Mûvatallî neqediya.  
Tengasiya Mûvatallî di nava qesrê de bû.  
Tengasiya Mûvatallî di hundir de bû.  
Tengasiya Mûvatallî mîna marekî reş li ser dilê wî rûniştibû.  
Navê vê tengasiyê Hattûşîlî bû.  
Hattûşîlî birayê heq ê Mûvatallî bû,  
kurê piçûk ê şahê mezin Mûrşîlî bû,  
birayê piçûk ê Mûvatallî Hattûşîlî.  
Hattûşîlî piçûk, lê hêrsa wî mezin bû.  
Mûvatallî walîtiya Kargaşayê dabû birayê xwe,  
lê wî zêdetir dixwest.  
Mûvatallî birayê xwe kir sererkanê artêşê,

lê wî zêdetir dixwest.  
Ji welatê Kaşgayê nûçeyên zêdegaviya Hattûşîlî dihatin.  
Hattûşîlî çav berdabû textê Mûvatallî,  
Hattûşîlî dixwest bikeve şûna birayê xwe.  
Mûvatallî mîna nexweşekî mirina xwe bizanibe  
ev yek dizanîbû.  
Mûvatallî behsa vê yekê ji Nûvanza re dikir.  
Nûvanza ji ber ku ev yek dizanîbû di tengasiyê de bû.  
Ji ber ku Nûvanza di tengasiyê de bû, ez jî di tengasiyê de bûm.


Li pêşiya Mûvatallî du rê dirêj dibûn.  
A pêşî, yan wê Peymana Şahê Mezin Telîpûnî yê bûye Xwe-  
da bin pê bikira,  
birayê xwe, bi destê xwe bikuşt.  
A din jî diviyabû text bi Hattûşîlî re parve bikira.

Mûvatallî fikirî, bi rojan, bi şevan fikirî;  
çare nedît, rê nedît.  
Bi Nûvanza şêwirî;  
Nûvanza jêre got xwîna birayê xwe nerijîne.  
Ji Xwedayan pirsî;  
Xwedayan jêre gotin xwîna birayê xwe nerijîne.  
Çû cem falbazan;  
falbazan jêre got xwîna birayê xwe nerijîne.  
Bi rûsîpiyan şêwirî;  
rûsîpiyan jêre got xwîna birayê xwe nerijîne.  
Rûsîpiyan jêre got ka niha Fermana Telîpînû yê niha Xwedaye  
bixwîne.  
Mûvatallî, Fermana Şah Telîpînû xwend.  
Fermana kevin a Şah Telîpînû weha digot:  
Di nava mala şah û keya de xwînrijandin zêde bû.  
Keybanî Îştapariya mir.  
Di ser re prens Ammûna jî mir.  
Mirovên Xwedayan weha gotin:

Li Hattûşayê xwînrijandin pîrr zêde bû.  
Li ser vê yekê, ez Telîpînû,  
min bang li civata esilzadeyan kir, ew civandin.  
Ji niha û pê ve, wê ti kesê nikaribe xerabiyê bi zarokeke  
malbata şahê Hattûşa bike, wê nikaribe kêrê lê bikişîne!  
Mêrê mezin ê li pêşiyê, prens, bila bibe şah!  
Eger li pêşiyê prens tinebe,  
di rêza duyemîn de kê kur be, bila ew bibe şah!  
Eger warisê text presek tinebe,  
kîjan keynika li pêşiyê, bila jêre zavayekî bigirin,  
bila ew bibe melîke!  
Di siberoj û ayende de kê piştî min bibe şah,  
bila zarok, bira, xizm, meriv û eskerên wî bi tifaq bin.  
Ji mala şah kesê nekuje.  
Ev, baş nîne.

Mûtavallî Fermana Şah Telîpînû yê bûye Xweda xwend.  
Û Mûtavallî biryara xwe da; wê xwîn nerijanda.  
Li şaşiyên Hattûşîlî buhurî.  
Fermana Telîpînû bin pê nekir.  
Bi şanê Xwedeyan destê camêriyê dirêjî birayê xwe kir,  
bi dilovanî birayê xwe himbêz kir.  
Biryar da; tac, text û welat bi birayê xwe re parve bike,  
lê Hattûşîlî wê hîn zêdetir bixwesta.  
Mîna dijminekî berê yê li çolê, mîna dûvpişkeke mezin a ji  
nav qûmê derdikeve, wê bixwesta bimeşiya heta welatê  
Hattiyê.

# KEVALA ÇAREMÎN





Ho! Kesê mezin ê qencyê mîna kincekî li xwe dike.  
Ho! Ew kesê bi qasî digere kesên lê digerin zêde dibin,  
ho! Ew kesê bi qasî bibîne wê were dîtin,  
ew xizmê min ê ji dûr tê.  
Min ji te re behsa Nûvanza kir,  
wexta hat mala me bi bavê min ê malmezin Marûvaş re peyivî,  
min ji te re behs kir min çî ji wan bihîstibû.  
Herçî ez ji karûbarên dewletê hez nakim,  
min li axaftinan guhdarî dikir ji bo dengê Nûvanza bibihîsim.

Lê ez karûbarên şahan hîn bûm,  
ez karûbarên qirêj ên şahan hîn bûm,  
ez karûbarên bi xwîn ên şahan hîn bûm,  
ez hîn bûm ku karûbarên wan ji yê bazirganekî erzantir in,  
ez karên wan ên bêrehim jî hîn bûm.  
Ji bilî axaftinên Nûvanza û bavê min,  
Înara jî ji min re behs kir,  
ji gotinên bavê xwe yê esilzade sernivîskarê qesrê Zûvappîş.  
Bi vî awayî ez hertiştî hîn bûm.  
Bi vî awayî, hertiştê ku ez hîn bûm min ji te re behs kir.

Min ji te re behsa du birayan kir ku ji bo text hew nemabû  
xwîna hevdu birijîn.

Min ji te re behsa du birayên şah kir ku şûrê xwe xistine kalan.  
Lê hînê min ji te re behs nekir ku firtoneyeke li çolê rabû çawa ezmanê welatê min reş û tarî kir.

Min ji te re hînê behs nekir ku ciwanên welatê Hattî çawa bi baranên xwînê hatin şuştin,

çawa ji Xwedayê Şer re weke qurbanî hatin pêşkêşkirin.

Min ji te re hînê behsa êşa dayikên zarokê xwe wendakirî nekir.

Min ji te re hînê behsa şîna bûkên jinebî,

bêhêvîbûna zarokên sêwî nekir.

Ji ber ku min hînê ji te re behsa eşqa xwe nekir.

Eger tu eşqa min nizanibî,

tu yê nikaribî bûyerên qewimî bizanibî.

Lê divê tu bizanibî çi qewimiye,

mîna tavheyva li ezmên digere rastiyan tam bizanibe.

Ne weke nivîsên Hattûşîlî li ser kevalan nivîsandî,

ne jî weke nivîsên Ramses li deriyên perestgehan kolane.

Şah timî kê m û çewt behs dikin.

Şah dixwazin ku timî sîha şûrê wan ji ser serê gel kê m nebe.

Şah weha difikirin:

Em çawa dikarin demdirêj li ser text bimînin.

Çawa dibe ku em karibin hîn zêdetir welatan dagir bikin.

Yê herî baş, yê herî dadperwer jî wisa difikire.

Ji ber ku wisa nefikire nabe şah.

Yek ji şertê şahbûnê fikirkirina bi vî awayî ye.

Mûvatallî wisa difikirî.

Hatûşîlî wisa difikirî.

Ramses wisa difikirî.

Çawa dibe ku em hînê zêdetir bibin xwedî erd,

çawa em karibin bibin xwedî kole, çawa karibin zêde bacê bidin hevdu.

Dema ew wisa difikirîn,

Min, roj bi roj evîneke bêderfet mezin fikir,  
min, evîneke nemumkin di bedena xwe de mezin fikir.  
Nûvanza bi tebesum û girnijînek xwe ez kiribûm keçeke  
ciwan.

Nûvanza bi girnijînekê ruhê zarok ê di hundirê bedena min  
de, kiribû keçeke ciwan.

Niha bedena min, hewl dida bi ruhê min re li hev bike.

Mîna koleyekî ling belovajî,  
li pey begê xwe yê bi hêz bi lez biçê,  
û hewl bide xwe bigihîne wî.

Bedena min, ruhê min çawa dixwest wisa şikil digirt.

Bedena min, mîna dareke têr av vexwarî, baş tavikdîtî,  
baş lê dihat nertin roj bi roj mezin dibû.

Bejna min dirêj dibû, kemaxên min gulover dibûn,  
pêsrên min gir dibûn.

Bedena min li pey ruhê min çûbû,  
eşqeke nemumkin mezin dibû.

Ne min bi tenê ev guhertina di bedena xwe de ferq fikir,  
kesekî din hebû, xwezî nebûya.

Kesekî din hebû, min çawa ji Nûvanza hez fikir,  
wî jî ji min hez fikir; xwezî hez nekiribûya.

Lê hez fikir, herî kêr bi qasî min ji Nûvanza hez fikir.

Kurê Zûvappîşê esilzade, hevalê min ê zarokatiyê Înara.

Înarayê belengaz, Înarayê bextreş û bê talih,

Înara ku gunehê wî bi tenê ew bû ji min hez kir.

Eger Nûvanza nebûya,

eger evîna min a ji bo Nûvanza nebûya,

evîna Înara têrê fikir ji bo ez bi wî re bizewiciyama.

Evîna Înara ew çend mezin bû,

tevî ku min weke birayekî jê hez fikir,

dîsa jî bêyî ez bifikirim ez ê pêre bizewiciyama.

Hezkirina wî ya ji bo min,

tenê bi ya min a ji Nûvanza re qiyasa wê dibû.

Ewqas ji dil bû, rast bû, ewqas neçar bû,  
ewqas bi keder, ewqas tijî hevî bû.  
Înara wexta li min dinerî stêrk bi çavên wî diketin.  
Înara wexta li min dinerî, rûyê wî zirav dibû.  
Rûyê wî bi qasî yê keçekê delal dibû, balkêş dibû.  
Li Hattûşayê ewqas keçik hebûn,  
xwe dixwarin ji bo Înara li wan binere.  
Lê çavên Înara ew nedidîtin,  
Înara çavên xwe ji min nedikirin.  
Bavê min Marûvaşê esilzade bi vê yekê dizanîbû,  
bavê Înara Zûvappîşê malmezin bi vê yekê dizanîbû.  
Dizanîbûn, lê ji hev re nedigotin.  
Di demeke nêz de ji hatina dema gotinê herdu jî piştrast bûn.  
Zûvappîşê esilzade ji bo şandina xelat û diyariyan,  
dest bi amadekariyan kiribû jî.  
Li gorî wan, ev zewac mîna hukmê Xwedaya Firtonê Teşûpê  
bû, neçar wê bibûya. Dema wexta wê bihata wê bibûya.

Lê hemû jî dixapiyan.  
Ji ber ku ruhê min ê birçûbûna wî mezin dibû,  
bedena min ê birçîbûna wî mezin dibû yê Nûvanza bû.  
Ev birçîbûna pîroz tenê bi Nûvanza dişkiya,  
lê haya Nûvanza ji vê yekê tinebû.  
Nûvanza wexta tenê çavên me li hev diketin,  
bi herdu çavên min ên mîna sotikên agir sor dibûn dizanîbû,  
bi rûyê min ê sor dibû dizanîbû,  
bi bedena min a mîna pelê li ber bayê diricifî dizanîbû.  
Nûvanza belkî rewşa min fêhm dikir,  
fêhm dikir, lê xwe li nefêhmkirinê datanî.  
Belkî jî fêhm nedikir,  
ev rewşa min dida xatirê tevgera min a mîna keçeke delûdîn.  
Yan jî fêhmnekirin li hesabê wî dihat.  
Lê fêhmnekirinê nikarîbûya ew biparasta.  
Ji ber ku agirê di goştê min de,

bi qasî ku hem min û hem wî bişewitîne har bû, bi pêt bû,  
bi hêz bû.

Her çend hişê min bigota neke jî,  
wê dilê min, goştê min bida pey xwe bibira nav nivîna  
Nûvanza.

Û ew roj dût nebû.

Û min ê di cejna benderrakirinê de a bikira kir.

Wê sibehê em zû rabûn,

wê sibehê me xwe paqij kir,

wê sibehê me kincên xwe yên xweşik li xwe kirin.

Wê sibehê me hewayê germ a Hattûşayê kişand cegerên xwe.

Wê sibehê em çûn pêşiya qesrê.

Wexta melîk û melîke derketin ber deriyê qesrê,

qesîdebêj û sazbandên bi kincên sor,

li cem Melîk û Melîkeyê cihê xwe girtin.

Wexta Melîk û Melîke amade bûn refên merasîmê ketin rê.

Bi meşê re sazbandan li amûrên xwe yên muzîkê xistin.

qesîdebêjan lavahî kirin û govend gerandin.

Melîk Mûvatallî û Melîke meşîyan.

Melîk û Melîke dema meşîyan silav li gel kirin.

Em ên esilzade, li pey Melîk û Melîkeyê meşîyan.

Em ên esilzade, me silav li gel kir.

Li pey me jî wezîfedarên qesrê dihatin.

Wezîfedarên qesrê qurbanên ji Xwedayan re bêne pêşkêşkirin hilgirtibûn.

Çavên her kesî, li Melîk Mûvatallî û Melîkeya di nava kincên bedew de bûn.

Lê min li Melîk û Melîkeyê mêze nedikir.

Min, li Nûvanzayê refekî li pey Mûvatallî dimeşîya mêze dikir.

Çavên min li wî aliqîbûn.

Lê belê merasîm rengo rengo bû.

Herçî muzîsyenên bi qabîliyet ên welêt bûn,

stranên xwe yên herî xweş digotin.

Herçî reqaseyên herî bi qabîliyet ên welêt bûn,  
 dansên xwe yên herî xweş direqisîn.  
 Herçî akrobatên herî bi qabîliyet ên welêt bûn,  
 cambaziyên xwe yên herî muhteşem dikirin.  
 Xelk civiyabûn li wan temaşê dikirin,  
 xema min nebû.  
 Min tenê Nûvanza şopand.  
 Min gavavêtinên wî, hejîna bedena wî ya xwegirtî,  
 serê wî yê bilind, rûkeniya wî bi kesên naskirî re şopand.  
 Jina wî Mannî li cem nebû,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Em gihîştin perestgehê,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Li perestgehê serkeşe em pêşwazî kirin,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Serkeşe merasîm da destpêkirinê û lavahî kirin,  
 Melîk û Melîkeyê li ber Xwedayan çong şikandin,  
 bi hurmet û rêz xwe tewandin,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Bêhna pixûriyê perestgeh tijî kir, qurban ji Xwedeyan re  
 hatin pêşkêşkirin,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Ref kêfxweş bû, gişan bi hev re xwarin,  
 şerab vexwarin, bîra vexwarin,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Wexta bû nivro, Nûvanza bi tenê ma,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Nûvanza ji şerabê û wexma germê tengijî, ber bi çem ve  
 meşiya,  
 min, Nûvanza şopand.  
 Nûvanza goşeyeke sape û xalî dît,  
 Nûvanza xwe li ber siya darê dirêj kir,  
 Nûvanza çavên xwe girtin,  
 min, Nûvanza şopand.

Û wexta şopandin zehmet bû,  
 ez ji şopandinê geriyam;  
 ez nêzîk bûm.  
 Ne mîna mareke xwe bi erdê re kaş dike,  
 mîna kûçikekî dilsoz ê naxwaze xwediyê xwe şiyar bike.  
 Mîna mihîneke esîl dixwaze nêzî suwarê xwe bibe,  
 lê bêdeng nêzîk bûm.  
 Ji heyecanê lêvên min zuha bûn,  
 ez nêzî wî bûm.  
 Dilê min mîna çivîkekê bi per bû, delodînî hilavêt,  
 ez nêzî wî bûm.  
 Çongên min dest bi lerizînê kirin,  
 ez nêzî wî bûm.  
 Min bêhnstendina wî bihîst,  
 her min bihîst ez hê zêdetir nêzî wî bûm.  
 Sînga fireh a Nûvanza,  
 min dît weke nepaxê dadikeve û radibe,  
 ez nêzî wî bûm.  
 Di bin piyê min de qirşîkek şikest,  
 ez nêzî wî bûm.  
 Nûvanza çavên xwe vekirin, ez dîtîm,  
 ez nêzîk bûm.  
 Nûvanza wexta ez dîtîm şaş nema,  
 gîrnijî,  
 çavên wî bi awayekî min berê hîç nedîtîbûn biriqîn.  
 Ez nêzîk bûm.  
 Awirên Nûvanza dijwar bûn, teyisandina çavên wî kûr bû.  
 Ez netirsiyam, ne bizdiyam,  
 ez nêzî Nûvanza bûm.  
 Nûvanza ber bi min ve hat.  
 Nûvanza bi destê min girt.  
 Nûvanza ez ber bi xwe ve kişandim.  
 Nûvanza xwe dirêjî min kir, stûyê min maçî kir.  
 Nûvanza destê xwe xist nava şeqê min.

Tiliyên Nûvanza şil bûn.  
 Nûvanza serê xwe xist bin kincên min ên fireh.  
 Pêsirên min dîtin, çiçikên min maçî kirin,  
 li min xweş hat.  
 Nûvanza kincên min derxistin.  
 Em mîna gîhayan, daran, çeman tazî man,  
 li min xweş hat.  
 Nûvanza bedena xwe di min de da,  
 li min xweş hat.  
 Nûvanza ji min hez kir,  
 Nûvanza ez girtim,  
 Nûvanza ez kirim jin, li min xweş hat.  
 Pêşî hinekî canê min êşiya, lê li min xweş hat.  
 Pêşî ez hinekî tirsiyam, lê li min xweş hat.  
 Ê paşê me xwe li kêleka hevdu dirêj kir.  
 Ê paşê ji min re got:  
 Tu çima ketî himbêza min?  
 Ê min jêre got:  
 Ji ber ku min ji te hez kir.  
 Nûvanza li rûyê min mêze kir û weha got:  
 Ez hevalê bavê te me.  
 Got:  
 Ez di temenê bavê te de me.  
 Got:  
 Jina min heye.  
 Got:  
 Kurê min heye.  
 Min got:  
 Ez tişteki ji te naxwazim.  
 Min got:  
 Mirovek çawa ji çemekî hez bike,  
 û haya çem ji wê mirovê nebe,  
 ez jî welê ji te hez dikim.

Min got:

Ez tişteki ji te naxwazim.

Zarokek çawa ji listikê hez bike,

û haya listikê ji zarok nîne,

ez jî welê ji te hez dikim.

Min got:

Zeriyek çawa bêyî kulîlkekê qut bike, ji dûr ve wê bêhn

bike û jê hez bike,

û haya kulîlkê ji keynikê nîne,

ez jî welê ji te hez dikim.

Min got:

Ez tişteki ji te naxwazim.

tenê rûkenî û gîrnijîna xwe kêr neke.

Nûvanza li rûyê min mêze kir.

Nûvanza wexta li rûyê min mêze kir çavên wî şil bûn.

Di çavên Nûvanza de du rondikan xuya kir.

Hinarkên esmer ên Nûvanza bi du rondikan şil bûn.

Lê Nûvanza gotinek bi tenê jî negot.

Min jî negot.


Em wisa li qiraxa çem rawestiyan.

Em wisa li bin daran rawestiyan.

Em wisa li kêleka hevdu rawestiyan.

Em wisa rawestiyan, li Hattûşayê cejin û roşan hebû.

# KEVALA PÊNCÊMÎN





Ho! Ew kesê bêhn, reng û hilma rojên dût ji min re aniye.  
Ho! Ew kesê ku bêyî min nas bike, bizanibe, ji bo min ketiye  
ser riyan.

Ho! Ew xwendevanê dilsoz ê gotarên min dane nivîsîn.

Hêvîdar im ku tu ji wan kesan bî, bizanibin eşq çî ye,

hêvîdar im tu yê li kirinên min binerî,

û min bi qanûnên bêrehm ê aqil mehkûm nekî.

Hêvîdar im ku dema tu kirinên min binirxînî,

wê dilê te jî tevî dadgeriyê bibe.

Hêvîdar im tê min gunehbar nekî.

Ji ber ku min xwe gunehbar kir.

Ji ber ku tu yê bi qasî min nikaribî min gunehbar bikî.

Ji ber ku ti kesê nikaribe min bi qasî min gunehbar bike.

Lê xwegunehbarkirin eşqê nakuje, geş dike.

Roja ez ji himbêza wî derketim,

Roja min mêraniya Nûvanza di hundirê xwe de his kir,

Ha wê rojê ku Nûvanza ji min veqetiya,

ez meşiyam nava Hattûşayê.

Ez meşiyam, lê Hattûşa êdî Hattûşaya berê nebû.

Xanî heman xaniyên berê nebûn.  
Dîwar heman dîwarên berê nebûn.  
Dar darên berê nebûn.  
Çivîk çivîkên berê nebûn.  
Çem çemê berê nebû.  
Û mirov heman mirovên berê nebûn.  
Mîna ku Xwedayê Rojê yê Ezmên,  
hêzeranê xwe bi qencyê li hertiştî xistibe,  
hertişt xweşik û delal bûbû.  
Te dît carinan Xwedaya Şerabê ji tasa xwe bi we dide  
vexwarin,  
hûn nikarin xerabiyên dinyayê bibînin,  
ha ez jî welê bûbûm.  
Herçî ez bûm, min dilopek şerab jî nexistibû devê xwe.

Herçî ez bûm, min dilopeke bîra jî nexistibû devê xwe.  
Lê ez mîna keseke ku bi nîmetên Xwedaya Şerabê hişê wê  
sivikbûyî bûm.  
Li kolanên Hattûşayê,  
ez bûbûm çivîkeke cotkaliyan difiriyam,  
Ez bûbûm pinpinîkek,  
ber bayê Hattûşayê ketibûm.  
Ez ji bedena xwe rizgar bûbûm, ez ji hişê xwe rizgar bûbûm,  
ez ji hertiştê ez girê didam rizgar bûbûm.  
Lê bi bîra min xistin.  
Ez ji hezkirina bavê xwe rizgar bûbûm,  
ji esilzadebûna xwe rizgar bûbûm,  
ji qanûnên Hattûşayê rizgar bûbûm.  
Lê bi bîra min xistin.  
Ez ji ezmên girtin, dîsa li ser rûyê erdê danîn.

Yê ev kir Înara bû.  
Hevalê min ê lîstikê, dostê min ê bi tenê,  
Înara yê tim digot, bexteweriya min dixwaze.

Înara wexta li rûyê min mêze kir,  
 fêhm kir min bextewerî ji yekî din dîtiye.  
 Rûyê ciwan ê Înara çilmisî.  
 Çilmisîn herdu çavên Înara yên mîna du stêrkan dibiriqîn.  
 Fêhm kir ku ez heta hetayî jê qut bûme.  
 Înara wexta ev fêhm kir bi hêrs pirsî:  
 Tu li ku bûyî?  
 Min got:  
 Tu çima dipirsî?  
 Wî jî ji min re got:  
 Ne ez, bavê te yê esilzade Marûvaş meraq û kakûniyan dike.  
 Min jî jêre got:  
 Ez ê bi bavê xwe re bipeyivim.  
 Înara careke din nepirsî. Li kêleka min meşiya.  
 Em mîna du çemên tevlîhev nabin bi hev re meşiyan.  
 Paşê Înara ji min re got:  
 Ez ê xelat û diyariyan ji we re bişînim.  
 Min fêhm kiribû ku çi dibêje, lê ez nepeyivîm.  
 Em mîna du çemên tevlîhev nabin bi hev re meşiyan.  
 Înara got:  
 Ez dixwazim tu êdî li mala min bimînî.  
 Em mîna du çemên tevlîhev nabin bi hev re meşiyan.  
 Paşê Înara ji min re got:  
 Em bizewicin.  
 Ez dîsa nepeyivîm.  
 Înara ket pêşiya min.  
 Ez mîna çemekî bi axê pêşî lê were birrîn,  
 min destpêkir herikîm hundirê xwe.  
 Înara li hemberî min sekînî û got:  
 Em bizewicin.  
 Min fêhm kir ku ez nebêjim wê nebe.  
 Min fêhm kir ku ez dilê Înara neşkînim,  
 Înara wê min fêhm neke.  
 Min fêhm kir ku ez nebêjim Înara wê min bernede.

Min got:

Em nikarin bizewicin.

Min got:

Ez weke hevalekî ji te hez dikim,  
nikarim weke mêrekî hez bikim.

Min got:

Ji xwe re jineke xweşik hilbijêre, ev heqê te ye,  
lê ew jin bila ne ez bim.

Xwedayê Çiyan çawa hêrs dibe, erdê dihejîne,  
Înara li hemberî min wisa hejiya.

Çawa Xwedayê Firtonê hêrs dibe,  
bi birûskan ezmên parçe bike,  
wisa ji çavên reş ên Înara rohnî çû.

Got:

Ez ê jinekê hilbijêrim, ew heqê min e.

Lê divê Xweda bizanibin ku ew ji te pêve kes nîne.

Heqê min e, ez ji te hez bikim,

lê divê Xweda bizanibin ku tu nebî jina Înara ti jinê nebe  
kebaniya wî.

Min got:

Em keriyên Xwedaya ne.

Xwedayan ji me re gotiye; eger kesek nebe jina we, ya din  
destnîşan bikin.

Înara ji min re got:

Min a xwe destnîşan kir. Tu jî ya xwe bike.

Min ji wî re got:

Ez ê kesî destnîşan nekim.

Înara ji min re got:

Nînatta derewan dike.

Nînatta yê xwe destnîşan kiriye.

Lê yê Nînattayê destnîşankirî, wê jêre nebe mêr.

Min jêre got:

Ez mêrekî naxwazim. Ez ê xwe pêşkeşî Xwedayan bikim.

Înara serê xwe hejand û got:

Nînatta derewan dike. Wê xwe pêşkêşî Nûvanza kir.  
 Înara serê xwe hejand û got:  
 Nînatta şaşiyê dike. Nûvanza jêre nabe mêr.  
 Nûvanza jina wî heye. Nûvanza ji jina xwe hez dike.  
 Nûvanza kurê wî heye. Nûvanza ji kurê xwe hez dike.  
 Nûvanza wê ji Nînattayê hez neke.  
 Nûvanza wê li Nînattayê mêze neke.  
 Nûvanza wê bi Nînattayê re nepeyive.  
 Nûvanza wê destê xwe nede Nînattayê.  
 Wexta Înara weha got,  
 ez mîna şepalên Xwedayê Rojê yê Ezmên hêrs bûm.  
 Înara wexta wisa got, şûna bexteweriya min hêrsê zevt kir.  
 Înara wexta wisa got, min xwest ez dilê Înara bişkînim.  
 Ê min jêre got:  
 Te pirsî bû, ez ji ku ve tîm, ez bibêjim.  
 Ji cem Nûvanza.  
 Nûvanza li min mêze kir, bi min re peyivî, destê xwe da min.  
 Bedena min û ya Nûvanza bûn yek.  
 Nûvanza bû yê min.  
 Ez bûm a Nûvanza.  
 Min welê got.  
 Lê herçî ya min û Nûvanza kiribû, zinê bû.  
 Ya min bi Nûvanza re kiribû guneh bû.  
 Cezayê vî gunehî giran bû.  
 Cezayê vî gunehî mirin bû.  
 Lê min xwe negirt û got.  
 Wexta Înara gotinên min bihîst,  
 rûyê wî mîna kevanêke bixwaze tîrê xwe biavêje rakişiya.  
 Çavên wî mîna kêreke tûj zirav bûn.  
 Zêde nesekinî,  
 fena berfa bihele û çemekî biherikîne,  
 wisa bi hêrs herikî û çû.  
 Wexta ew çû ez xemgîn bûm, ji ber ku min ew xemgîn kiribû.  
 Wexta ew çû ez poşman bûm,  
 ji ber ku min ew poşman kiribû.

Lê hinekî jî dilê min rehet bûbû.  
Ji ber ku îro nebûya sibê,  
neçar min ê heman gotin jêre bi aniya ziman.  
Înara dema bexteweriya min bir û çû,  
ez jî ketim riya mala xwe.  
Eger min bizanibûya Xweda wê ji min hêrs bibûna,  
ez ê neçûma malê.  
Min ê li pey Înara bazdana, ew rawestandana.  
Eger min ê bizanibûya wê çi biqewime,  
Min ê bi destên Înara bigirta, hêrsa wî bi gotinên şîrîn  
bitemiranda.  
Eger min bizanibûya Înara wexta ji min veqetiya wê biçe  
cem Nûvanza,  
min ê jê lêborîna xwe bixwesta, xwe li ber piçûk bixista.  
Lê min nizanîbû. Min bîr nebir. Min fêhm nekir.  
Ax! Min hîç nizanîbû.  
Wexta min zanîbû jî Xweda ji zû ve verşiyabûn hêrsa xwe.

Bavê min ê esilzade Marûvaş xeber anî malê.  
Înara miribû.  
Înara li ser şûrê Nûvanza can dabû.  
Rûyê bavê min reş bû.  
Mîna kurê wî yê heq miribe rondik ji çavên wî rijiyan.  
Mîna birayê wî yê heq bibe mêrkuj li xwe xist.  
Wexta min nûçeya felaketê ji bavê xwe bihîst, ez wer mat-  
mayî mam.  
Eger bi kêra herî tûj jî goştê min jêbikira wê dilopek xwîn  
jê nehata.  
Min mîna zinarên li çiyayê pîroz nikarîbû xwe bilivînim,  
min nikarîbû bibînim, nikarîbû bipirsim.  
Bavê min rondikên çavên xwe paqij kirin behsa bûyerê kir.  
Li naverasta Hattûşayê,  
Înara bi hêrs bi ser Nûvanza ve çûye.  
Nûvanza pêşî bi henekî rahiştîyê. Daye ciwaniya Înara.

Nûvanza serserîtiya vî zîlamê ciwan,  
daye tesîra xirab a şerabên di merasîmê de vexwariye.  
Xwestiye biçe, derbas bibe mala xwe ya aram.  
Lê Înara ew bernedaye, heqaretên xwe dewam kirine.  
Nûvanza vê carê henekê xwe pê kiriye.

Gotiye:

Eger tu dixwazî zora min bibî em herdu jî bi conegayan re  
gulaşê bikin.

Kî berê zora conega bibe bila ew serketî be.

Lê Înara guhdarî nekiriye.

Gotiye:

Ya rastî tu kesekî tirsonek î.

Eger eskerên te nebûna wê ti serketinên te nebûna.

Gotiye:

Her kes te esilzade dizane.

Ya rastî tu kesekî derewker î.

Herçî tu yî, tu bi hevalên xwe re îxanetê dikî.

Jêre gotiye:

Tu mirovekî rezîl î.

Tu li cihên xewle yên tarî bi bexteweriya mirovan dilîzî.

Ev çend giran hatiye bi Nûvanza.

Gotiye:

Êdî bes e.

Gotiye:

Ev çend heqaret bes in. Eger tu huş nebî,

wê şûrê min bi te re bipeyive.

Înara qebûl kiriye xwe lê rakişîne.

Gotiye:

De were.

Nûvanza dîsa jî bi îhtiyat pêre pevçûye.

Diyare ku dilê wî nebûye bikuje.

Diyare ku xwestiye bi cezayekî piçûk sînorê wî nîşanî wî bide,


sînorê vî ciwanê sînor nenas.

Lê Înara mîna Misriyekî dijmin li hemberî wî şûrê xwe  
li ba kiriye,  
êrîş biriye ser Nûvanza.  
Û wexta milê Nûvanza bi şûr dibirre.  
Hişê Nûvanza ji serî çûye, îhtiyata xwe ji dest daye.  
Şûrê hoste yê Nûvanza di gava sisiyan de bedena Înara  
derbas kiriye,  
bedena hevalê min ê lîstikê,  
dilê Înarayê belengaz ê ji bo min hildiavêt.  
Û hînê Înara çawa ketiye erdê, Nûvanza ji kirina xwe  
poşman bûye.  
Şûrê xwe rakiriye li kevir daye.  
Mîna kurê xwe yê heq kuştibe, digirî tevî şûrê xwe.  
Paşê çûye xwe radestî parêzvanên xwe kiriye.  
Gotiye:  
Min bigirin.  
Vî mêrkujê ku ciwanek kuştiye bigirin.  
Eskerên wî matmayî bûne li hemberî vê xwesteka  
fermandarê xwe.  
Nûvanza gotiye:  
Hûn hînê çi disekin. Min kesek kuşt.  
Mirovê kesekî bikuje heta Meclîsa Pankû biryarê bide  
girtî ye.  
Min bigirin.

Ha ev gotin anîn ziman bavê min ê esilzade.  
Bi vî awayî min bihîst, Înara miribû.  
Bi vî awayî min bihîst, xwezî min nebihîstibûya.  
Nûvanza bûbû mêrkuj, ez bi vî awayî hîn bûm,  
xwezî hîn nebûma.  
Xweda ji min xeyidîbûn,  
min bi vî awayî fêhm kir, xwezî min fêhm nekiribûya.  
Bi vî awayî ez neçar mam, mîna kevirê li çiyayê pîroz.

# KEVALA ŐEŐEMİN





Ho! ew kesê ku wê agirê şabûnê ji nû ve vêxîne,  
hêviyan bike şahî, şahiyên bike rastî.  
Ez dizanim, çîroka min çîrokeke xweş nîne.  
Ez dizanim, gotinên tu dibihîsî dilê te reş dîkin.  
Ji ber vê yekê, min bibexşînî.  
Lê Xwedayan çarenûseke hînê baştir,  
ji bo min nebexşandin.  
Xwedayan li Qadeşê lanet li min kirin,  
lê herçî ez bûm, min Qadeş nizanîbû.  
Xwedayan bi Qadeşê mohr li temenê min xistin,  
lê herçî ez bûm, min navê Qadeşê nebihîstibû.  
Xwedayan li Qadeşê bextewerî ji destên min stendin,  
lê herçî ez bûm, ti car li ber Xwedayan ranebûbûm.  
Xwedayan aqil dan min, min jî bi kar anî.  
Xwedayan beden dan min, min bi kar anî.  
Çima ez ceza kirim, min fêhm nekir.  
Min tenê ji Nûvanza hez kir.  
Min nexwest Înara bimire.

Min nexwest Nûvanza bibe mêrkuj.  
Min nexwest bavê min bigirî.  
Min nexwest bavê Înara Zûvappîş bigirî.  
Min nexwest jina Nûvanza Mannî bigirî.  
Min nexwest kurê Nûvanza Zîtîş ji malbata xwe veqete.  
Min tenê ji Nûvanza hez kir.  
Lê Xwedayan ez ceza kirim.  
Û ez bi rojan bûm mîna keviran.  
Û min bi rojan ne xwar, ne vexwar,  
min nedît, min dest neda, neliviyam, min tenê guhdarî kir.  
Min her êvarê ji bavê xwe yê vedigeriya malê,  
serhatiya Nûvanza guhdarî dikir û ew zilamê bi tenê bû  
min jê hez dikir.

Wexta Nûvanza xwe radestî eskerên xwe kiribû,  
wexta hatibû bihîstin Nûvanza Înara kuştiye,  
li Hattûşayê erd û ezman lerizîbûn.  
Bavê Înarayê belengaz, yek ji zilamê girîng ê Meclîsa Pankû bû,  
sernivîskar Zûvappîş wexta nûçeya mirinê ya kurê xwe  
bihîstiye,  
bawer nekiriye ji guhên xwe.  
Mîna henekeke xirab fêhm kiriye.  
Lê wexta ku cenazeyê bi xwîn ê kurê wî hatiye ber malê,  
wexta destên wî yên pîr bi xwîna ciwan a kurê wî bûne,  
fêhm kiriye ku felaketê vê carê li deriyê wî daye.  
Tevî jina xwe dûvûdirêj kurê xwe himbêz dike û digirîn.  
Paşê termê kurê xwe yê hînê sar nebûye berdide.  
Xwe rast kiriye û gotiye:  
Ez ji bo xwîna xwe xwînê dixwazim.  
Gotiye:  
Ez ji bo canê xwe can dixwazim.  
Gotiye:  
Bila melîk vê kuştinê bibîne.

Gotiye:

Bila Meclîsa Pankû bicive.

Gotiye:

Bila mêrkuj were cezakirin.

Melîk Mûvatallî jî weke Hattûşiyân,  
matmayî bûye, xemgîn bûye, perîşan bûye.

Di nava du dostan de, di nava du zilamên girîng de wer maye.

Li aliyekî fermandarê wî yê herî pê ewle Nûvanza ku,  
wî wenda bike, wê hem li hemberî dijminên derve,  
hem jî wê li hemberî birayê xwe yê heq Hattûşîlî qels bibe.

Li aliyê din zilamê xurt ê Meclîsa Pankû sernivîskar

Zûvappîş ku,

wî wenda bike, wê zirarê bide rûmeta xwe.

Melîk Mûvatallî rojekê rawestiyaye.

Melîk Mûvatallî du rojan rawestiyaye.

Melîk Mûvatallî sê rojan rawestiyaye.

Melîk Mûvatallî rawestiyaye,

heta termê Înarayê bextreş hatiye şewitandin.

Rawestiyaye ku êşa Zûvappîş bitemire.

Rawestiyaye ku firtoniya dilê Zûvappîş rakiriye dakeve.

Ma êşa kezebê derbas dibe gelo?

Wexta bedena ciwan a Înara li ser êzingên pîroz şewitiye,

wexta bedena Înara bûye agir û li Xwezaya xwedayan hêz

zêde kiriye,

dûmana Înara qelibiyê mija Xwedayan,

Zûvappîş derketiye pêşberî Melîk Mûvatallî.

Gotiye:

Ez dadê dixwazim.

Gotiye:

Ez ji xwîna xwe re xwînê dixwazim

Gotiye:

Ez ji canê xwe re can dixwazim.

Gotiye:

Bila Melîk vê kuştinê bibîne.

Gotiye:

Bila Meclîsa Pankû bicive.

Gotiye:

Bila mêrkuj were cezakirin.

Mûvatallî hewl daye bi maqûlî hêmin bike,  
dilê pîremêr ê mîna conegayekî bi hêrs û hêçbûyî.

Mûvatallî hewl da bi pêçe,  
dilê pîremêr ê mîna şêrekî birîndar xwîn jê diçe.

Mûvatallî hewl daye nerm bike,  
dilê pîremêr ê mîna qertelekî birçî yê dilbêrehim.

Lê Zûvappîş aş nebûye.

Gotiye:

Ji xwîna xwe re xwîn dixwazim. Ji canê xwe re can.

Mûvatallî gotiye:

Temam. Meclîsa Pankû bila sibê bicive.

Temam. Bila Meclîsa Pankû cezayê vî gunehî bide.

Mûvatallî welê gotiye,

lê Nûvanza bi çarenûsa wî re rûbirû nehiştiye.

Bi endamên esilzade yên Meclîsa Pankû re yek bi yek peyiviye.

Ji wan re yek bi yek behsa bûyerê kiriye.

Gotiye:

Hûn Nûvanza nas dikin.

Gotiye:

Nûvanza ji bo vî welatî gelek tişt kirin.

Gotiye:

Nûvanza mêrkuj nîne.

Gotiye:

Min li şahidan guhdarî kir. Înara ew kişandiyê nava şer û pev-  
çûnê.

Gotiye:

Hûn jî li şahidan guhdarî bikin.

Gotiye:

Canek çû bila yekî din jî neçe.

Roja din esilzadeyên Meclîsa Pankûyê biryara xwe  
eşkere kirine.

Esilzadeyan di biryara xwe de gotiye:  
 Rast e, Nûvanza bi şûrê xwe Înara kuşt.  
 Lê Înara pevçûn destpê kir. Şahidan ev yek dîtiye.  
 Şahidan ev yek ji me re got. Em vê yekê dizanin.  
 Înara pevçûn destpê kiriye.  
 Lê Înara mir.  
 Nûvanza ew kuşt. Şahidan ev yek ji me re got.  
 Ji ber vê yekê, me weha biryar da:  
 Nûvanza gunehkar e, ji ber ku Înara kuştiye.  
 Lê Înara ew neçar hiştiye.  
 Ji lewra Nûvanza mirinê heq nake.  
 Lê ew canekî deyndarê malbata Înara ye.  
 Ji ber vê yekê, wê Nûvanza kurê xwe yê heq Zîtîş bide  
 Zûvappîş.  
 Û Zûvappîşê ji Nûvanza hîç bi rik û kîn nebe.  
 Eger Zûvappîş rikê bike, wê Meclîsê ji nû ve bicive.  
 Lê eger Nûvanza deynê xwe yê xwînîbûnê nede,  
 eger Nûvanza kurê xwe Zîtîş nede Zûvappîş,  
 wê canê xwe di berdêla kurê xwe de bide.  
 Wexta bavê min ev nûçe anî, bedena min xwe berda.  
 Ji zimanê min ê axaftin ji bîr kiribû qêrînek bilind bû,  
 rondikên xwînî ji çavên min bariyan.  
 Ez mîna kevirekî ketim zemînê mala me yê ji kevir.  
 Di heman demê de qêrîneke din bilind bû,  
 ji çavên jineke din rondikên xwînî bariyan.  
 Di heman demê de jineke din weke kevir ket ser zemînê  
 mala xwe yê ji kevir.  
 Ew jina Nûvanza, diya Zîtîş Mannî bû.  
 Maniya bêguneh, Manniya ji bûyeran bêxeber,  
 Manniya belengaz.  
 Diya Zîtîş bûbû qurban, Mannî bûbû qurban.  
 Wexta biryara Meclîsa Pûnka bihîst bawer nekir ji guhên xwe.  
 Li gor baweriya wê Nûvanza, mêrê wê bêguneh bû.  
 Înara zarokekî xeşîm û hinekî jî dîn bû.

Ji nişkê ve derketibû pêşiya Nûvanza. Xwe dabû kuştinê.  
 Mannî wexta bihîst biryara Meclîsa Pankûyê,  
 ket mîna kevirekî, ket ser zemînê xanî yê ji kevir.  
 Ji bo bi ser xwe ve bê, av li rûyê wê reşandin.  
 Mannî wexta bi ser xwe ve hat, tavi lê derket pêşberî Melîkeyê.  
 Got:  
 Mêrê min bêguneh e.  
 Got:  
 Mêrê min xirabî çî ye nizane.  
 Got:  
 Hûn mêrê min nas dikin. Mêrê min qehremanek e.  
 Got:  
 Ev biryar pir giran e.  
 Got:  
 Ev biryareke pir bêînsaf e.  
 Got:  
 Zarokê min ji destê min negirin.  
 Melîkeyê rewş dizanîbû.  
 Mûvatallî ji Melîkeyê re gotibû siyaset çawa dixwaze.  
 Melîkeyê got:  
 Em Nûvanza nas dikin. Nizane xirabî çî ye.  
 Got:  
 Em Nûvanza nas dikin. Nûvanza qehremanek e.  
 Got:  
 Lê xortek mir. Kurê Zûvappîşê esilzade Înara.  
 Got:  
 Ne hespek e, ne mîhek e, ne golîkek e.  
 Mirovek mir. Kurê Zûvappîşê esilzade Înara.  
 Got:  
 Biryar bêînsaf nîne. Biryar adil e.  
 Got:  
 Xemgîn nebe. Tu ciwanî, wê zarokekî te yê din çêbibe.  
 Li ser vê yekê, Mannî li Melîkeyê mêze kir.  
 Li ser vê yekê, Mannî fêhm kir ku biryar ê neguhere.

Li ser vê yekê, Mannî rondikên çavên xwe herikandin  
 hundirê xwe.  
 Li ser vê yekê, Mannî derket ji qesrê.  
 Li ser vê yekê, Mannî vegeriya mala xwe.  
 Kurê xwe yê ji hertiştî bêxeber,  
 nava rojê kûr razayî himbêz kir.  
 Dil nehişt kurê xwe hişyar bike û himbêz kir.  
 Qêmîş nekir hişyar bike û kurê xwe bêhn kir.  
 Dil nehişt hişyar bike û kurê xwe maçî kir.  
 Paşê Nûvanza çû malê.  
 Wexta Mannî dîtiye kela dilê wî rabûye, Zîtîş himbêz kiriye.  
 Û Nûvanza ji jina xwe re got:  
 Ez canê xwe bidim. Em Zîtîş nedin wan.  
 Û Nûvanza ji jina xwe re got:  
 Ti gunehê Zîtîş nîne.  
 Û Nûvanza ji jina xwe re got:  
 Ti gunehê te jî nîne. Min Înara kuşt.  
 Divê ez bidim, berdêla xwîna min rijandiye.  
 Mannî li Nûvanza mêze kir û got:  
 Çima?  
 Got:  
 Ji min re bibêje. Çima Înara bû dijminê te?  
 Nûvanza got:  
 Ez nizanim.  
 Nûvanza got:  
 Herhal hinekan ew sor kiriye.  
 Got:  
 Belkî jî ji şerabê bû. Belkî ji bîrayê. Hewa jî germ bû.  
 Belkî ez şaş fêhm kirim. Ez nizanim, çima.  
 Nûvanza ez parastim.  
 Nûvanza navê min belqitiyê parast.  
 Nûvanza navê min negot ji Manniyê re.  
 Nûvanza ji kesî re negot,  
 navê min ê bûbû sedema mirinan.

Mannî li mêrê xwe mêze kir.  
Mannî mêrê xwe nas dikir.  
Mannî ji mêrê xwe bawer nekir.  
Lê tiştêkî din jê nepirsî.  
Roja din hatin Zîtîş birin.  
Qêrînek ji mala Manniyê bilind bû.  
qêrîneke aliqî ma  
mîna ewrekî reşî tarî li ser mala Nûvanza.  
Mannî bi kurê xwe re hişê xwe şand.  
Mannî bi kurê xwe re dilê xwe şand.  
Mannî bi kurê xwe re kêfxweşiya xwe şand.  
Mannî bi kurê xwe re hêviya xwe şand.  
Mannî bi kurê xwe re hertiştê ji jiyanê li bendê bû şand.  
Û Mannî ewqas pir tişt bi kurê xwe re şandin,  
ji mirinê zêdetir tiştêk nema.  
Û Mannî canê xwe da, çemê jiyan dida Hattûşayê.

Nûvanza wexta miriyê jina xwe di çem de dît,  
dema ava sor a çem canê şîrîn a Manniyê bir,  
Nûvanza velîst, dîn û har bû.  
Nûvanza serî rakir li Xwedayan.  
Ne çû perestgehan, ne qurban, ne boraq dan,  
ne jî lavahî kirin.  
Mîna şêrekî birîndar bû ku li mirinê bigire.  
Ji bo belayeke nû neqewime,  
Melîk Mûvatallî Nûvanza ji Hattûşayê şand.  
Ew bi ser begekî Kaşgayî yê serîrakirî ve şand.  
Nûvanza bi dilxweşî ev wezîfe qebûl kir.  
Êdî ji bo Nûvanza kêfxweşiyeke mezin bû,  
wexta nêzî mirinê bûya.  
Ez li Hattûşayê mam.  
Hişê min bi Nûvanza re meşiya bi ser Begê Kaşgayî ve.  
Ez li Hattûşayê mam.  
Rihê min bi Nûvanza re xwe çeng kir,

ser şervan û cengawerên Kaşgayî.  
Û pir derbas nebû, Nûvanza li rûyê sar ê Xwedayê Mirinê  
rast hat.

Û Nûvanza berî ku li Xwedayê Mirinê rast bê,  
min ev yek di xewna xwe de dît.

Nûvanza li hespekî sipî suwar bûbû.

Kincekî sipî li ser hebû.

Bi mertalekî sipî xwe diparast.

Destiyekî sipî yê bivirê wî hebû.

Şervanek derket hemberî wî.

Li hespekî reş suwar bûbû.

Kincekî reş li ser hebû.

Bi mertalekî reş xwe diparast.

Û destiyê şûrê wî reş bû.

Nûvanza wexta kesê reşgirêdayî dît,

mîna li jina xwe ya mirî rast bê, girnijî.

Mîna kurê xwe yê bi rojan nedîtiye bi xwestek û bi dil xwe  
çeng kir ser şûrê destiyê wî reş.

Şûrê şervanê kincreş firtone qelaşt.

Şûrê şervanê kincreş,

daket ser mertalê sipî yê Nûvanza.

Nûvanza hulkumî,

mîna zilamekî ji aliyê conegayekî ve hatibe birîndarkirin  
hulkumî.

Nûvanza bi zehmetî li ser hespê xwe yê xurt sekinî.

Şervanê reşgirêdayî mîna canîkekê xwe jêhatî çeng kir.

Ji nû ve şûrê xwe dawesand.

Nûvanza vê carê amade nebû.

Vê carê nikarîbû mertalê xwe rake.

Şûr ê vê carê li serê Nûvanza biketa.

Lê ji nişkê ve Mannî xuya kir. Ji nava ewrekî sipî.

Mannî ji nişkê ve di nava kincên xavik û tenikî de xuya kir.

Mannî ji nişkê ve xuya kir,

bi kenê xwe yê li ser lêvên xwe yên beriya kurê xwe wenda bike.

Ewrê Mannî ket navbera şûr û Nûvanza.

Û ewrê Mannî Nûvanza parast.

Û ez bi qêrînekê ji xew hişyar bûm.

Û min fêhm kir ku tiştek bi Nûvanza hatibû.

Û ji wê şevê pêve,

li benda nûçeyên ji Nûvanza bên rawestiyam.

Û ji wê şevê pêve xew bi çavên min neket.

Û ji wê şevê pêve ez li şûna xeyalan,

bi nûçeyên ji Nûvanza bên naliyam, kaliyam.

Li şûna nûçeyê, Nûvanza bi xwe hat.

Birîndar, hema bêje nîvmirî.

Û hekîm û sêhrbaz li serê fermandarê mezin kom bûn.

Û li mala wî kî hebû, xizmetkar, kole li serê wî kom bûn.

Û min nikarîbû êdî li mala xwe bimama.

Û ez bi rojan çûm mala Nûvanza,

li ber serê wî rawestiyam.

Û ji yên ji min re gotin tu çima tê, min got:

Nûvanza hevalê bavê min e. Nûvanza mervê me ye.

Min got:

Nûvanza bi tenê ye. Kesekî Nûvanza nîne.

Min got:

Nûvanza mervê me ye.

Bi vî awayî ez li mala bi keder a Nûvanza mam.

Bi vî awayî ez mam,

di nav çar dîwarê malê de ku min bi destê xwe

tifika wê tefandibû.

Bi vî awayî ez li ber serê Nûvanza mam.

Ji bo Nûvanza nemire...

Eger Nûvanza bimire, ji bo ez jî bi wî re bimirim.

Lê Mala Xwedê ava Nûvanza nemir.

Maliava Nûvanza çavên xwe vekirin.

Wexta wî çavên xwe vekirin pêşî ez dîtîm.  
 Di çavên wî de westandin hebû.  
 Di çavên wî de kedereke kûr hebû.  
 Di çavên wî de tariyeke min nas nedikir hebû.  
 Çawa çavên wî ez dîtîm, ez naskirim.  
 Got:  
 Nînatta.  
 Got:  
 Nînattaya şîrîn.  
 Got:  
 Nînattaya wêrek. Min tim tu di xewna xwe de dîtî.  
 Min di xewna xwe de tim tu û Mannî dîtî.  
 Li cem Mannî tim Zîtîş hebû. Tu bi tenê bûyî.  
 Te tenê li min dineherî.  
 Got:  
 Nînatta, di nava tariyê de çavên te mîna rojê rohnî dida.  
 Mannî bi destên te girtibû. Mannî bi destên min girtibû.  
 Mannî di ber xwe de straneke bi keder dinihurand.  
 Mannî di ber xwe de çarenûsa xwe dinihurand.  
 Nînatta tu bêdeng bûyî.  
 Nînatta ez jî bêdeng bûm.  
 Bêdengiya me ji Çiyayê Pîroz girantir bû.  
 Bêdengiya me ji cezayê Xwedayên zalim bidana girantir bû.  
 Nînatta, te çi bi min kir?  
 Nînatta, min çi bi te kir?  
 Nînatta, me çi kir bi jina min û kurê min?  
 Wexta Nûvanza welê got,  
 rondikên çavên min xwe negirtin.  
 Wexta Nûvanza welê got,  
 şerm mîna xwîneke reştarî bi ser rûyê min de meşîya.  
 Wexta Nûvanza welê got,  
 ez mîna koleyeke gunehê xwe bizanibe  
 di nava bedena xwe de piçûk bûm û min xwe guvaşt.  
 Wexta Nûvanza welê got,

ji bo ez birevim ji şerma xwe,  
ez reviyam ji dîwarên dor li xaniyên Nûvanza girtibûn.

Lê xilasî tinebû ji vê yekê.  
Şerm li her deverê bû. Şerm li her deverê bi min re bû.  
Wexta ez bi rojan çûm mala Nûvanza,  
mirovan fêhm kiribû çima Înara miriye,  
mirovan fêhm kiribû çima Zîtîş dane malbata Înara.  
Mirovan fêhm kiribû bê çima Mannî xwe avêtiye çem.  
Mirovan fêhm kiribû ku Nînatta gunehkar e.

# KEVALA HEFTEMİN





Ho! Ew kesê ji demeke ji salan wêdetir tê,  
ji bo laneta, min di pençeya xwe de dinalîne rake.  
Ho! Ew kesê ji bo çarenûsa min a xirab digirî.  
Li Hattûşayê her kes bûbû dijminê min.  
Tenê bavê min ê esilzade Marûvaş bawer nekir,  
ji gotegotên mîna lehiyekê li Hattûşayê rabûbûn û çizirîbûn  
malan.  
Ji min pirsî:  
Rast in, gotinên min bihîstine?  
Ji min pirsî:  
Te ji Nûvanza hez kir?  
Ji min pirsî:  
Ji ber vê Înara miriye. Ji ber vê Mannî miriye.  
Ji ber vê, tifika Nûvanza vemiriye.  
Min ji bavê xwe re got.  
Erê, min ji Nûvanza hez kir.  
Min ji bavê xwe re got.  
Erê, ji ber vê Înara mir.

Erê, ji ber vê kuçika Nûvanza temirî.  
 Min ji bavê xwe re got.  
 Lê min nexwestibû welê bibe.  
 Min nexwest Înara bimire.  
 Min nexwest Nûvanza bibe mêrkuj.  
 Min nexwest Zîtîş ji Manniyê were veqetandin.  
 Min nexwest Mannî aramiyê di nava ava sor a çem de bibîne.  
 Min nexwest tifika Nûvanza vemire.  
 Min tenê ji Nûvanza hez kir.  
 Wexta bavê min Marûvaşê esilzade ev gotin bihîstin,  
 rondik ji çavên wî bariyan  
 ser hinarkên rûyê wî yê rengqelibî û qermiçi.  
 Wexta bavê min Marûvaşê esilzade ev gotin bihîstin,  
 ez himbêz kirim.  
 Bavê min Marûvaş ez fêhm kiribûm.  
 Ê min fêhmkiribû ku ez bi şens im,  
 ji ber ku Marûvaş bavê min e.  
 Ji min re got:  
 Êdî her dever çirav e.  
 Ji min re got:  
 Êdî tu xezalek î, ku ketiye riya çiravê.  
 Ji min re got:  
 Divê haya te ji te hebe.  
 Ji min re got:  
 Mirov xirab in. Şanebûna te, şabûn e, ji bo wan.  
 Ji min re got:  
 Mirov xirab in. Çarenûsa reş a Nînattayê, şahî ye ji bo wan.  
 Ji ber vê yekê, ji Nûvanza dûr bisekine. Êdî dev jê berde.  
 Biavêje ji hundirê xwe,  
 çawa koleyek firêzê ji nava zeviyan diavêje.  
 Min jêre got:  
 Ho! Bavê min ê esilzade.  
 Bavê min ê bi dil û hişê xwe esilzade,  
 ne bi payeya melîk dayê.

Tu dizanî ez derewan li te nakim.  
Ez nikarim Nûvanza ji bîr bikim.  
Lê eger tu bibêjî jê dûr bisekine, ez ê hewl bidim.  
Lê ez nikarim bibêjim ez ê karibim.  
Ji ber ku min hewl da, min nikarîbû.  
Eger tu bixwazî ez ê hewl bidim, biceribînim,  
lê ez ê karibim, nizanim.  
Wexta min wisa got, kedera bavê min hê kûrtir bû.  
Lê êdî wekî din gotin ji deva derneketin.  
Ew nepeyvî, lê gotegotên li ser me zêde bûn,  
bûn firtone rabûn, ser qesrê girtin.

Melîk Mûtavallî di rewşeke tengav de bû.  
Nûvanza di devê her kesî de bû.  
Eger ne Nûvanza, lê kesekî din bûya,  
Mûvatallî bêyî rehmê bike wê pirsgirêk çareser bikira.  
Lê Mûvatallî nikarîbû ji Nûvanza bigeriya.  
Nûvanza ne tenê fermandar bû.  
Nûvanza dostekî dilsoz bû.  
Nûvanza melîkiyetên di bin mohra melîktiyê de nas dikirin.  
Nûvanza dizanîbû kîjan melîk mêrxas, kîjan tirsonek,  
kîjan dilsoz, kîjan baş, kîjan xirab,  
kîjan ehmeq, kîjan bi aqil e.  
Bi melîkan re şer kiribû, bi melîkan re peyvî bû,  
bi melîkan re peymanên aştiyê danîbûn,  
bi melîkan re xwarin xwaribû,  
bi melîkan re şerab vexwaribû.  
Mûvatallî, nikarîbû ji Nûvanza bigeriya.  
Ji ber ku wexta gelaciya me li Hattûşayê,  
mîna ewrekî reş li ezmên digeriya,  
ji jêr ewrekî reş bi navê Ramses  
bi ser welatê Hattî ve dimeşiya.

Ramses, li yek ji bajarên Hattiyê zinarê serketinê verotibû,  
kolabû.

Li ser Nivîsandibû ku ev welat ê wî ye.

Li ser Nivîsandibû ku ev welat ê Misrê ye.

Ramses dixwest laneteke razayî hişyar bike.

Ramses dixwest birîneke kewiyayî ji nû ve derb bike.

Ramses dixwest çîrokeke xirab ji nû ve vebêje.

Çîrok bi lanet bû, bi xwîn bû, kevnar bû. Pir kevin bû.

Bi qasî rojên Xweda Melîk Şûppîlûlûma kevnar bû.

Melîk Şûppîlûlûma ku niha Xweda ye, welatê Hattî fireh kir.

Çiyayên asê, deştên bi bereket, çem û golên avşîn,

qesr, perestgeh, Xwedayên perestgehan

tevlî welatê Hattiyê kir.

Welatê Hattiyê, bû welatekî mezin.

Melîk Şûppîlûlûma bû melîkekî mezin.

Wexta Melîk Şûppîlûlûma mezin dibû Misr piçûk dibû.

Li Misrê firewnan hevdu dikuştin.

Li Misrê zilamekî ciwan, Tûtenkamon bûbû melîk.

Lê li Misrê melîk temendirêj nebûn.

Tûtenkamon jî zêde nejiya.

Jina Tûtenkamon, xuşka wî ya heq Ankesenamon bû.

Wexta Tûtenkamon mir, Ankesenamon a çav bedew tirsiya.

Ji ber ku Serkeşe Eje dixwest bibe melîk.

Ji bo bibe melîk jî, dixwest bi Ankesenamon re bizewice.

Melîke Ankesenamon jî ev yek dizanîbû.

Ankesenamon, nedixwest bi Serkeşe Eje re bizewice.

Serkeşe Eje bi israr bû.

Serkeşe Eje xurt bû.

Li welatê Misrê kesê li dijî Serkeşe Eje rawestiya tinebû.

Melîke Ankesenamon bi vê yekê dizanîbû.

Ji ber ku bi vê dizanîbû ji Melîk Şûppîlûlûma re  
nameyek şand.

Got:

Ho! Melîkê xurt ê welatê Hattiyê.

Ho! Zilamê mezin ku navê wî li welatê min jî bi rûmet  
tê hildan.

Mêrê min mir.

Zarokê min tinene.

Lê li cem te kur pir in.

Çima tu ji kurên xwe yekî nadî min.

Eger tu ji kurên xwe yekî bidî min,

ez ê wî ji bo xwe bikim mêr.

Melîkê Mezin Şûppîlûlûma name xwend.

Name xwend û hişên wî tevlîhev bû.

Ji gotinên Ankesenamoyê bawer nekir.

Melîk Şûppîlûlûma mezinên Hattiyê kom kirin.

Name ji wan re jî xwend.

Hişê mezinên Hattiyê jî tevlîhev bû.

Û Melîk Şûppîlûlûma qasidekî xwe şand Misrê.

Qasid kesekî pê bawer bû.

Navê qasid Hattûşa-zîtî bû.

Rêwîtiya Hattûşa-zîtî bi rojan ajot.

Hattûşa-zîtî bi rojan li Misrê ma.

Hattûşa-zîtî piştî rojan ji Misrê vegeriya.

Pêre nameya duyemîn a Melîke Ankesenamonê hebû.

Melîke Ankesenamonê weha digot:

Ho! Melîkê mezin ê welatê Hîtîtan.

Ho! Zilamê mezin ku navê wî li welatê min jî bi hurmet  
tê hildan.

Çima tu ji min bawer nakî?

Çima tu difikirî ku ez henekê xwe bi te dikim?

Min tenê ji te re nivîsand, ne ji kesekî din re.

Tê gotin ku gelek kurên te hene.

Eger tu yekî ji kurên xwe bidî min,

Ew ê hem bibe mêrê min, hem jî bibe melîkê Misrê.

Melîkê mezin Şûppîlûlîûma ji gotinên Ankesemonê bawer kir.  
 Bawer kir, ji dawetnameya ji dil a melîkeya neçar.  
 Ê kurê xwe Zannanza bi yekîneyeke eskerî şand Misrê.  
 Lê Zannanza ti car negihîşt Misrê.  
 Pisporekê dekûdolabên qesrê Serkeşe Eje,  
 Eje yê roj dijmartin ji bo bi Ankesenamonekê re bizewice,  
 Eje yê ji bo bibe melîk dişewitî,  
 artêşa Misrê ajot ser yekîneya Hîtîtan.  
 Ê pir bêrehim prens Zannanza kuşt.  
 Prens Zannanza û hevalên wî.  
 Melîk Şûppîlûlîûma wexta bi vê bûyerê hisiya,  
 hêrs bû mîna conegayekî.  
 Mîna şerekî birîndar hurmîn pêket.  
 Ji Xwedayan re sonda tolhildanê xwar.  
 Ji bo alîkariya tolhildanê bikin, qurban pêşkêşî Xwedayan kirin.

Lê niyeta Xwedayan cuda bû.  
 Xwedayan xwe amade dikirin ji bo welatê Hattiyê ceza bikin.  
 Ê ev ceza bi avê hat, bi axê hat, bi firtonê hat.  
 Negot zarok, ciwan, pîr û kal mirovên Hattiyê şikandin.  
 Mirov bi şewbê ketin. Mirinan bi mehan dewam kir.  
 Qêrînên ji malan hilatin bi mehan dewam kir.  
 Vê laneta reş ta canê Melîk Şûppîlûlîûma stand dewam kir.  
 Kengî Melîk Şûppîlûlîûma ket nav nivînan,  
 kengî rûyê esmerî yê Melîk Şûppîlûlîûma mîna erdê zuha  
 zer bû,  
 kengî awirên Melîk Şûppîlûlîûma yên mîna bazan sist bûn,  
 lanet jî bi dawî bû.  
 Bi çûna lanetê re şewb jî bi dawî bû.  
 Bi çûna lanetê re mirin jî çû.  
 Lê nefreta ji Misriyan her ma.  
 Her çend Melîk Şûppîlûlîûma miribû jî,  
 nefreta wî ya ji bo Misriyan hîç nemir.  
 Her prensê Hîtîtan bi vê nefretê ji dayik bû.

Bi vê nefretê mezin bû.  
 Ev nefret mîna birînekê hertim di dilan de ma.  
 Ha Ramses dixwest vê birînê derb bike.  
 Ramses dixwest herdu welatan bi xwîna vê birînê bişo.  
 Tehlûke li ber sînor bû. Tehlûke nêzîk bû.  
 Tehlûke li ber deriyê me bû.  
 Mûvatallî cara pêşî bû fikar dikirin.  
 Mûvatallî cara pêşî bû ditirsiya.  
 Mûvatallî sibeyekê zû rabû.  
 Mûvatallî li ser ban li pêşberî Xwedayê Rojê,  
 du maseyên ser wan bi hesîlan nuxumandî danîn.  
 Yek ji maseyan ji bo Xwedawenda Rojê ya Bajarê Arîna,  
 ya din jî ji bo Xwedayên din danî.  
 Li ser her maseyê sîh û pênc nanê qurbanê,  
 hûrikê genimê sorgul, rûnê nivîşkî,  
 dîzikên tijî kutilkên di nav rûn de sorkirî,  
 tasên mişt danû,  
 sîh şerbik şerab danî.  
 Wexta ev dihatin amadekirin Mûvatallî derket ser bên.  
 Mûvatallî derket pêşberî Xwedayan.  
 Mûvatallî ji Xwedawenda Rojê ya Bajarê Arîna re,  
 Ji Xwedayê Rojê yê Ezmên re,  
 Ji Xwedayê Firtonê yê Brûskê û Xwendayên din re weha got:  
 Xwedayê Rojê yê Ezmên  
 û Parêzvana min Xwedawenda Rojê ya Arîna,  
 Melîke Parêzvana min, melîkeya welatê Hattiyê,  
 Melîkeyê Ezmên Xwedayê Firtonê,  
 Melîkeya Parêzvana min Xwedawend Hepat,  
 Melîkê Ezmên Xwedayê Firtonê yê Hattiyê...  
 Hemû Xwendayên mêr û Xwendayên jin,  
 Giş çem û çiyayên welatê Hattiyê,  
 Xwendayên ku efendiyên min in,  
 Xwedawenda Rojê ya Arînnayê Parêzvana min,  
 û giş Xwendayên welatê Hattiyê,

Efendiyên min,  
 ez rahîbê we me,  
 we ji bo min serdestiya welatê Hattiyê îlan kir.  
 Xwedayên min, niha gotin û lavahiya beniyê xwe bibihîsin!  
 Efendiyên min, Xwedayên min,  
 ez ê lavahiya perestgeh û peykerên we bikim...  
 Efendiyên min, Xwedayên min, guh bidin min!  
 Van lavahiyên min bibihîsin!  
 Efendiyên min,  
 ev gotinên ez weke lavahiyan ji we efendiyên xwe re dibêjim,  
 hûn Xweda qebûl bikin!  
 Wan bibihîsin!  
 Ji van gotinên xwe ên weke lavahî ji we Xwedayan re  
 pêşkêş dikim,  
 eger ên hûn nexwazin bibihîsin hebin,  
 ji ber ku ew ji devê kesekî bi mirin derdikeve,  
 bihîstina wan bidin aliyekî din!  
 Va ye, ez melîk Mûvatallî,  
 rahîbê Xwedawenda Rojê ya Arrînayê  
 Ê giş Xwedayan,  
 Ez, ji te re, ji Xwedayê Rojê yê Ezmên re lavahiyê dikim.  
 Tu efendiyê min Xwedayê Rojê yê Ezmên,  
 îro Xwedayan rake!  
 Kîjan Xwedayê min îro min ji bo lavahiyê bang lê kir.  
 Tu Xwedayê Rojê,  
 bang li wan bike,  
 ji ezmên, ji erdê, ji çiyê,  
 ji çeman, ji perestgehan, ji textan!  
 Efendiyê min, Xwedayê Brûskê, ez mirovek bûm.  
 Bavê min, rahîbê Xwedawenda Rojê ya Arîna  
 Ê giş Xwedayan bû.  
 Bavê min ez anîm dinê.  
 Tu Xwedaya Firtonê ya Brûskê, te ez ji diya min girtim.  
 Te ez mezin kirim.

Te ez ji bo Xwedawenda Rojê ya Arînnayê  
 Û giş Xwedayan kir rahîb!  
 Te ez li welatê Hattiyân kirim melîk!  
 Te ez li ser text dame rûniştandin!  
 Ez Melîk Mûvatallî,  
 Ez weke kesekî ji aliyê te Xwedayê Firtonê yê Brûskê ve  
 hatime mezinkirin,  
 lavahiyan li te dikim.  
 Min ji kîjan Xwedayan re lavahî kir,  
 Min bang li kîjan Xwedayan kir,  
 dilê wan bi min bişewitîne!  
 Gotinên ji min, ji zimanê beniyê te Mûvatallî têne xwarê  
 bigire!  
 Wan bibe li ber Xwedayan deyne!  
 Bila Xweda lavahiyên min paşve nezîvirînin!  
 Çawa çivîk ji bo bijî hêlîna xwe dibîne,  
 min jî tu dîtî Xwedayê Firtonê yê Brûskê,  
 Min tu dîtî. Min bide jiyîn!  
 Ez kîjan lavahiyê ji bo Xwedayan dikim,  
 wan gotinên min bixîne hundirê Xwedayan!  
 Bila min bibihîsin!  
 Min tu hertim mezin kirî. Ez ê te hertim mezin bikim.  
 Ez ê Xwedayê Firtonê yê Brûskê wê demê jî mezin bikim!  
 Di paşerojê de kurê min, neviyên min, melîk, melîke,  
 prensên welatê Hattiyê, serbazên min,  
 wê hertim ji efendiyê min Xwedayê Firtonê, yê Brûskê re  
 bi hurmet bin û wê weha bibêjin:  
 Ew bi rastî, Xwedayekî bi qudret, qehreman,  
 Xwedayekî xwe gîhandibû mezinahiyê.

Mûvatallî bi vî awayî bang li Xwedayan kir.  
 Mûvatallî bi vî awayî alîkarî ji Xwedayan xwest.  
 Û Xwedayan tiştêkî eşkere jêre negot.  
 Û Xwedayan jêre negot, em li cem te ne.

Û Mûvatallî fêhm kir ku wê ji Xwedayan alîkarî neyê.  
 Û fêhm kir ku çareya bi tenê bi mirovan re dibe.  
 Û fêhm kir ku çareya bi tenê bi şervanan re dibe.  
 Ha ji ber vê yekê, Mûvatallî ji Nûvanza negeriya.  
 Ji ber ku şer li ber derî bû.  
 Ji ber ku dewleta Amûrû rûyê xwe jê guherî bû.  
 Melîkê Amûrûyê di kevala jêre şandî de weha digot:  
 Em heta îro ji te re xizmetkarên dilsoz bûn, lê ji niha û pêve na.  
 Mûvatallî nikarîbû dev ji Nûvanza berda.  
 Ji ber ku şerê mezin nêzîk bû.  
 Û Mûvatallî biryara xwe da.  
 Û wexta Nûvanza ji nav nivînan derket,  
 û ne wexta dilşa bû, lê wexta siheta wî baş bû,  
 Melîk bang lê kir.  
 Jêre got:  
 Bela, mîna teyrên dirinde li ser serê me digere.  
 Xwedayê Rojê yê Ezmên doh bi şev xwe nîşanî min da.  
 Ji min re got; şer nêzîk e.  
 Ji min re got: xwe ji bo şer amade bikin.  
 Xwedayê Rojê yê Ezmên ji min re got; Nûvanza bişîne.  
 Got; Nûvanza bişîne bila here welatê Nahrîna, Pîdasa,  
 Dardanoî, Masa, Karkîsa û Lîkiyayê.  
 Bila bi beg û mîrnîşînên wan re bipeyive,  
 bila wan ji şer re amade bike.  
 Bila bi beg û mîregên welatên din re jî bipeyive.  
 bila wan jî ji şer re amade bike.  
 Got:  
 Şer ê zor û zehmet be.  
 Got:  
 Şerekî welê wê berê hîç nehatibe dîtin.  
 Got:  
 Di vî şerî de wê Nûvanza alîkarê te yê herî mezin be.  
 Got:  
 Di vî şerî de Nûvanza ji birayê te yê heq nêzîktirî te ye.

Got:

Ew ne tenê femandarek e, ew weke melîkekî ye.

Got:

Ew mîna melîkekî dikare li ser navê te bipeyive.

Got:

Xwedayê Rojê yê Ezmên ji min re welê got.

Nûvanza matmayî bû.

Nûvanza bawer dikir ku Xwedayan ew terikandiye.

Nûvanza bawer dikir ku Xweda jê xeyidîne.

Nûvanza gotinên Mûvatallî

mîna lêbihurîna Xwedayan şîrove kir.

Nûvanza wezîfeya Mûvatallî dayê qebûl kir.

Bi vî awayî, wê ji Hattûşayê, ji min Nînattayê dûr bima.

Bi vî awayî, wî yê ez û xwe biparasta.

Bi vî awayî, Nûvanza ji Hattûşayê çû.

Bi vî awayî, Nûvanza destpê kir,

melîk, beg, mîreg li dora Mûvatallî kom kirin.

Bî vî awayî, Nûvanza ji Hattûşayê û ji min Nînattayê dûr ma.

Û bi vî awayî min hînê zêdetir jê hez kir.

Bi vî awayî min zêdetir bêriya wî kir.

Paşê, rojekê Nûvanza lêxist hat.

Mîna buhara piştî rojên zivistana bi berf û tarî,

lêxist hat.

Mîna gotineke şîrîn derket hat.

Mîna gîrnijîneke germ derket hat.

Nûvanza bi nûçeyên xweş hat.

Li çend welatan, bi çend mîr û began re peyivîbû, jêre gotibûn:

Em bi Melîkê Mezin ê Welatê Hattiyê Mûvatallî re ne.

Zadê me zadê wî ye, sewalên me sewalên wî ne,

eskerên me eskerên wî ne, tîr û şûrê me yê wî ne.

Mûvatallî bi vê kêfxweş bû.

Lê wexta heman kêfxweşî  
 li ser rûyê Nûvanza yê ji rojê qemirî nedît,  
 xemgîn bû. Xwest alîkariya vî zilamê dilsoz bike.  
 Rûnişt pêre peyivî.  
 Rûnişt pêre peyivî. Ne mîna melîkekî, lê mîna dostekî.  
 Jêre got:  
 Bi kesê mirî mirov namire, ew çûye welatê miriyan.  
 Çawa ava çeman ji zinaran dixwe û parçeyekî ji wan dibe,  
 kesê/a mirî jî ji me çûye.  
 Kesê/a mirî wê êdî tenê bi Xwedayan re bipeyive.  
 Ji ber ku Xwedayan ew birine cem xwe.  
 Jêre got:  
 Kesê mayî li welatê jiyanê ye.  
 Kesê mayî wê bijî. Kesê mayî wê ji bîr bike û bijî.  
 Eger hesret û bêrîkirin pîroz be, jibîrkin jî pîroz e.  
 Jêre got:  
 Bi vî awayî nabe.  
 Mêrek bi tenê nikare bijî.  
 Ji te re jinek divê.  
 Nûvanza mîna bizineke serhişk ji vê dûr sekinî.  
 Got:  
 Şer nêzîk dibe.  
 Got:  
 Jin li lingê şervanekî digere.  
 Ez ê wisa bi tenê, zêdetir bi kêra melîkê xwe bêm.  
 Mûvatallî melîkekî zîrek bû.  
 Mûvatallî mêrekî zîrek bû.  
 Mûvatallî li hemberî dijberiya Nûvanza girnijî.  
 Got:  
 Tu dizanî.  
 Lê eger ez Nûvanza bûma,  
 eger keynîkek ji min hez kirî hebûya,  
 tew keynîkek ji ber min ketibe nav dev û diranan,  
 ez hîç nedifikirîm min ew dikir keybaniya mala xwe.

**Bêguman, wê bi vê yekê Xweda jî kêfxweş bûna.  
Nûvanza mîna conegayekî ingirî dût sekinî ji vê pêşniyarê.**

**Got:**

**Nabe.**

**Got:**

**Ez ê careke din kesî nekim keybaniya mala xwe.**

**Got:**

**Jiyan bi tenê baş e.**

# KEVALA HEŞTEMİN





Ho! Ew kesê ku wê laneta mezin ji ser min rake,  
Ho! Ew kesê ku wê bibe kêfxweşiya min.  
Min ji bavê xwe Marûvaş bihîst,  
Nûvanza ez nexwestime,  
Nûvanza ez hilnebijartime.  
Min bihîst û ez êşiyam.  
Min bihîst û ez xemgîn bûm.  
Min bihîst û hêviya min şikiya.  
Û ez li Manniyê fikirîm.  
Ez li mirina Manniyê fikirîm.  
Û min xwe xist şûna Manniyê.  
Û min ji xwe re got:  
Belkî divê ez jî xwe biavêjim ava çem.  
Belkî ez jî di nava ava sor a çem de li aramiyê bigerim.  
Belkî ez jî divê xatir ji welatê jîyanberan bixwazim,  
li deriyê welatê miriyan bidim.  
Mîna kurmê bikeve darê, ev fikir ket hişê min.  
Û bavê min li min mêze kir.

Li min mêze kir û dît,  
 mirina di reşika çavê min de mezin dibû.  
 Li min mêze kir  
 û fêhm kir ku keça wî dixwaze welatê jiyamberan biterikîne.  
 Ê bavê min devê xwe venekir, tiştêk negot.  
 Ê bavê min ji malê derket, çû.  
 Ê min xwe ji bo mirinê amade kir.  
 Ê min ji bo mirinê hiş, dil û bedena xwe amade kir.  
 Ê ez ê bimirama.  
 Ê bavê min pîresêhr Îştapariya anî malê.  
 Min Îştapariya dît.  
 Min çavên Îştapariyayê yên di tariyê de dibiriqîn dîtin.  
 Îştapariya hat û destê xwe danî ser eniya min.  
 Îştapariya hat û destê xwe danî ser zikê min.  
 Îştapariya hat û destê xwe da lingên min.  
 Îştapariya ez berdama,  
 berê xwe da Xwedawenda Rojê û kire gazî.  
 Got:  
 Ho! Xwedawenda Rojê ya sihrê.  
 Ho! Xwedawenda bi qudret, te dawetek danî.  
 Te hemû Xweda vexwendin,  
 te hemû mirov vexwendin,  
 lê te bang li nexweşa min nekir.  
 Xwedayan xwar û vexwar,  
 mirovan xwar û vexwar,  
 lê nexweşa min nexwar,  
 nexweşa min hat ji bîr kirin.  
 Te çima bang li vê keynika nexweş nekir?  
 Ev nexweşê,  
 tu Xwedawenda Rojê kiribû Xwedaya xwe ya sereke.  
 Ji kerema xwe re bang lê bike,  
 ji kerema xwe re bila ew jî tevî me bibe.  
 Bihêle bila ew jî bixwe û vexwe.  
 Bihêle bila ew were cem te Xwedawenda wê ya Sereke.

Bihêle bila nexweşa min were.  
Bihêle bila keynik were.  
Bihêle bila dîsa bi ser xwe ve were.  
Bihêle bila ji bo Xwedawenda Rojê bibe beniyêke baş.  
Bihêle bila timî ji te re qurbanan bîne.

Îştapariyayê welê got.  
Îştapariyayê rûnê dûv derxist.  
Îştapariyayê rûnê dûv heland.  
Îştapariyayê got:  
Ha ev rûn çawa heliya çû,  
bila xirabî jî welê bihele biçê, tine bibe.  
Û xirabî çû tinebû,  
Û dilê Xwedawenda Rojê ya Arînayê bi min şewitî.  
Û Xwedawenda Rojê ya Arînayê sê şevan li pey hev  
xwe nîşanî min da.  
Ji min re got:  
Bendewar be.  
Ji min re got:  
Ava sor a çem ji derdê te re çare nîne.  
Ji min re got:  
Bendewar be.  
Eger tu zanibî bendewar bî, tu yê bigihîjî miradê xwe.  
Ji min re got:  
Eger tu zanibî bendewar bî, wê yê tu dixwazî bê.  
Ji min re got:  
Li ser te laneteke mezin heye.  
Laneteke pir bi hêz e. Mêrekî mirî heye, jineke mirî heye  
û zarokekî terikandî heye.  
Pêşî divê ew lanet rabe.  
Ji min re got:  
Bendewar be.  
Eger tu bizanibî bendewar bî wê bexteweriyê bê.


Xwedawenda min sê şevan li pey hev wisa got.  
 Ê ez şeva sisiyan hişyar bûm.  
 Ê wexta ez hişyar bûm, min li ber serê xwe,  
 bavê xwe yê rûniştî dît.  
 Min di çavên bavê xwe yê li ber serê min rûniştî de hêsir dît.  
 Min fedî kir, ji ber ku min mirin xwestibû.  
 Min fedî kir,  
 ji ber ku min xwestibû vî kalemêrî bihêlim û biçim.  
 Bavê min destê xwe danî ser eniya min.  
 Ji min re got:  
 Wexta diya te mir tu zarokeke piçûk bûyî.  
 Ji min re got:  
 Diya te mir û min ji jineke din hez nekir.  
 Gelek jin ketin nav nivîna min.  
 Min ji ti jinan bi qasî diya te hez nekir.  
 Ji min re got:  
 Ez hezkirinê dizanim. Ez êşê dizanim.  
 Ez dizanim hezkirin çawa jiyanê dike êş.  
 Ji min re got:  
 Lê jiyan ji dildariyê hêjatir e.  
 Ji min re got:  
 Jiyan ji dildariyê mezintir e.  
 Ji min re got:  
 Jiyan xweştir e ji dildariyê,  
 nebî nebî dest ji jiyanê bernedî.

Gotinên wî manedar bûn.  
 Gotinên wî xweş bûn.  
 Gotinên wî rast bûn.  
 Lê tesîr li min nekirin.  
 Min mîna guliyê hatibe birrîn stûyê xwe xwar kir.  
 Bavê min stûyê min ê xwarbûyî dît,  
 wî jî stûyê xwe xwar kir. Wî jî ez fêhm kirim.  
 Ji min re got:

Hêviya xwe nebirre.  
Eger darek hînê hişk nebûbe,  
vê demsalê na, wê demsaleke din bişkoka veke.  
Vê demsalê na, wê demsaleke din mêwan bide.  
Hema bila tenê hişk nebe.

Ez xemgîn bûm, ji ber ku min bavê xwe xemgîn kiribû.  
Min ji xwe re got:  
Ez ê êdî bavê xwe xemgîn nekim.  
Min ji xwe re got:  
Ez ê êdî mîna Xwedawenda min ji min re gotî  
bendewar bim.  
Min ji xwe re got:  
Ez ê welê ji jiyanê hez bikim.  
Û min biryar da;  
Ji bo ez careke din li Nûvanza rast neyê.  
Û min biryar da;  
Ji bo ez careke din li Nûvanza nefikirim.  
Û min biryar da;  
Ji bo ez careke din navê Nûvanza hil nedim.

# KEVALA NEHEMÎN





Ho! Ew kesê ji aliyê Xwedayê Rojê yê Ezmên  
û Parêzvana min Xwedawenda Rojê ya Arînayê hatiye  
hilbijartin.

Ho! Ew kesê li çarenûsa min a reş şahidî kir...

Ho! Ew kesê li îradeya min a pûçbûyî mîna dareke nava wê  
vala şahidî kir.

Ho! Ew kesê şahid e ku bê eşqê ez çawa mîna guliyekî  
ketibe çem, li vî peravî û li wî peravî dixîne.

Min biryar dabû ez li Nûvanza rast neyê.

Min biryar dabû ez li Nûvanza nefikirim.

Min biryar dabû ez navê Nûvanza hilnedim.

Min nikarîbû xwedî li soza xwe derkevim.

Her çend min xwestibû bavê xwe xemgîn nekim,  
ez xwe xemgîn nekim,

navê xwe yê di nav dev û diranan de pak bikim,

min nikarîbû xwedî li soza xwe derkevim.

Ez serê sibehekê derketim ji malê.

Ez serê sibehekê di kolanên bi kevir ê Hattûşayê re  
derbas bûm.

Ez serê sibehekê çûm ber mala Nûvanza.  
 Min xwe li pişt darekê veşart.  
 Min xwe veşart heta Nûvanza derkeve.  
 Min xwe veşart heta siya Nûvanza bikeve kolanê.  
 Wexta ew ji derî derket, ez jî ji pişt darê derketim.  
 Ez dîtîm û girnijî.  
 Ez dîtîm û rawestiya.  
 Ez dîtîm û pirsî:  
 Tu çawa yî Nînatta?  
 Min got:  
 Bi mehan e, îro roja min a herî xweş e,  
 ji ber ku min tu dîtî.  
 Min got:  
 Bi mehan e, îro roja min a herî xweş e,  
 ji ber ku tu bi min re girnijî.  
 Min got:  
 Bi mehan e, îro roja min a herî xweş e,  
 ji ber ku tu bi min re peyivî.  
 Min got:  
 Mala te ava.  
 Tebesum û girnijîn li rûyê Nûvanza belav bû.  
 Girnijîna Nûvanza bû rohaniyeke şîrîn û li bedena min belav bû.  
 Ji min re got:  
 Te çima welê got?  
 Min tu hertim dîtî.  
 Ez hertim bi te re digirnijim.  
 Ez hertim bi te re dipeyivim.  
 Min got;  
 Min got qey tu yê min nebînî.  
 Min got qey tu yê bi min re nepeyivî.  
 Min got qey tu ji min xeyidiyî.  
 Çavên Nûvanza xunavî bûn.  
 Ji min re got:  
 Ez ji te nexeyidîme.

Eger ez bixeyidim, ez ê bi xwe re bixeyidim.  
 Min tu gunehbar nekirî.  
 Eger ez gunehbar bikim, ez ê xwe gunehbar bikim.  
 Min got:  
 Bi xwe re nexeyide,  
 eger tu yê bixeyidî bi min re bixeyide,  
 ji ber ku min ev bela anîn serê te.  
 Nûvanza serê xwe hejand.  
 Ji min re got:  
 Na, te ev bela neanîn serê min.  
 Min bi xwe xwest.  
 Na, tu nînî berpirsiyarê belayên li serê me;  
 ji ber ku min jî ji te hez kir.  
 Eger min nexwesta, min tu nêzikî xwe nedikirî.  
 Eger min nexwesta, min destê xwe nedida te.  
 Tu ji bo min hewesek nînî.  
 Tu bexteweriyek î,  
 tu şahiyek î,  
 tu kederek î,  
 tu êş î,  
 tu serberzî yî,  
 tu birîn î,  
 tu hêvî yî,  
 tu çaranûsa min î, ku nikarim biguherînim.  
 Wê wextê ez bi kêfxweşî lerizîm.  
 Wê wextê ez bi kêfxweşî giriyam.  
 Wê wextê min got:  
 Çima tu min nabî mala xwe.  
 Min got:  
 Wê wextê tu çima min weke heval nabî cem xwe?  
 Çima tu tenê dijî mîna Xwedayên xeydok?  
 Çima tu min stûxwar dihêlî?  
 Mîna belangazekî Xweda jê xeyidî,  
 Nûvanza bi destê xwe rondikên çavên min zuha kirin.

Ji min re got:  
 Ma qey tu dibêjî li min xweş tê ez ji te dût dijîm?  
 Ji min re got:  
 Ez jî dixwazim Nînattayê bibim mala xwe.  
 Ji min re got:  
 Ez jî dixwazim hertim Nînattayê li cem xwe bibînim.  
 Ez jî dixwazim roja xwe, şeva xwe,  
 nivîna xwe bi Nînattayê re parve bikim... Lê ez nikarim.  
 Tu jî nikarî.  
 Ji min re got:  
 Di navbera me de du mirî hene.  
 Ji welatê miriyan du mirî li me mêze dikin.  
 Du mirî hene, dikevin xewnên min.  
 Xwedayan rûyê xwe ji me badan.  
 Xweda ji me hêrs bûn.  
 Du mirî di navbera me de hene.  
 Berdêlek heye divê em bidin wan.  
 Xwedayê Rojê yê Ezmên ji min re behsa rojên xerab dike.  
 Ez çûm cem falbazê. Du marên reş avêtin nava avê.  
 Mar ber bi tariyê ve çûn.  
 Maran ber bi tariyê ve lîst.  
 Paşê mar ji nava tariyê, xwînê, xirabiyê derketin.  
 Mar ber bi zelalbûnê ve çûn.  
 Maran di nava ava zelal de bejnên xwe yên reş li hev badan.  
 Rohniyên bedenên wan çavên min tarî kirin.  
 Falbaz ji min re got:  
 Rojên zor li pêşiya te ne,  
 wê derbas bibin.  
 Veqetînen dirêj li pêşiya te hene,  
 wê derbas bibin.  
 Rojên bi êş li pêşiya te hene,  
 wê derbas bibin.  
 Hema tenê bila kesek li benda te bimîne.  
 Hema tenê bila mirovek ji te bawer bike.

Hema tenê bila kesek ji te hez bike.  
Hema tenê bila tu jî li benda wê bimînî.  
Hema tenê bila tu jî ji wê bawer bikî.  
Hema tenê bila tu jî ji wê hez bikî.  
Bendewarî tenê çare ye ji bo te.  
Bawerkirin tenê çare ye.  
Hezkirin tenê çare ye.  
Sebir tenê çareye ji bo te.  
Min ji falbazê pirsî:  
Wê çiqas bajo ev li bendêmayîn?  
Falbazê ji min re got:  
Wê dirêj bajo.  
Ji ber ku Xweda gelekî ji te xeyidîne.  
Falbazê got:  
Wê dirêj bajo.  
Pêşî wê li Başûr şerek biqewime.  
Wê şerek biqewime li rûyê erdê şerekî welê nehatibe dîtin.  
Di wî şerî de wê gelek mirov bimirin,  
wê gelek xwîn birije,  
wê gelek jin bigirîn.  
Dîsa jî wê hêrsa Xwedayan neqede.  
Falbazê got:  
Wê dirêj bajo,  
şerê biqede, aştiyê bê,  
rewşa nediyar, mîna mija xwe li çiyayê pîroz badaye,  
wê her deverê zevt bike.  
Min ji falbazê pirsî:  
Ez ê çawa fêhm bikim lanet rabûye?  
Falbazê got:  
Xwedayê ji te re nîşaneyekê bişînin.  
Xwedayê ji te re biyaniyekê bişînin.  
Ew biyanî yê lanetê rake.  
Min ji falbazê pirsî:  
Kî ye, ew biyanî? Wê çawa lanetê rake?

Falbazê got:

Ez wê nizamim.

Min a maran di hewdik de nîşanî min dan ji te re got.

Ez jî vegeriyam mala xwe.

Min gotinên falbazê fêhm nekirin.

Xwedayê Rojê yê Ezmên bi şev li min eyan bû û ji min re vegot.

Xwedayê Rojê yê Ezmên got:

Ho! Nûvanzayê mêrxas,

ho! Nûvanzayê bêçare,

ho! Nûvanzayê gunehkar.

Bendewar be...

Ji bo xwepaqijkirinê bendewar be.

Ji bo xwegîhandinê bendewar be.

Ji bo bexteweriyê bendewar be.

Li benda wî biyaniyî be ku ji demeke ji salan wêdetir bê.

Ew ê te paqij bike,

ew ê te bigihîne miradê te,

ew ê te bextewer bike.

Bazinekî ji duwanzdeh xelean bide çêkirin.

Her xelegeke bazin bibe bajarekî din ê welêt.

Li ser her xelegeke bazin,

navê bajarê tu yê xelega din bibiyê bide nivîsandin.

Bazinan li duwanzdeh bajarên cihê veşêre.

Li ser her xelegekê cihê veşartinê binivîsîne.

Paşê bendewar be.

Li benda biyaniyê ji demeke ji salan wêdetir tu yê bimînî.

Bila biyanî bê.

Bila bê û bazinên li bajarên dûr berhev bike.

Bila berhev bike, bîne cem hev.

Ha wê wextê wê laneta reş ji ser te rabe.

Ha wê wextê tê bigihîje miradê xwe.

Ha wê wextê bexteweriyê li deriyê te bide.  
Ha welê Nînatta. Xwedayê Rojê yê Ezmên welê ji min re got.

Wexta evîna min a bi tenê Nûvanza welê got,  
ji kêfa re çavên min tijî rondik bûn.  
Xuya bû di dawiya dawî de em ê bigîhana hevdu.  
Gelek sal derbasbûna jî em ê di dawiya dawî de  
bigîhana hevdu.  
Min jî jêre behsa vegotina Xwedawenda Rojê ya Arînayê kir.  
Nûvanza kêfxweş bû wexta bihîst.  
Wer xuya bû, her çend gelek sal derbasbûna jî  
em ê di dawiya dawî de bigîhana hevdu.

# KEVALA DEHEMÎN





Ho! Ew kesê piştî rojên tarî tê.  
Ho! Ew kesê li qatê Xwedayan tê naskirin,  
li qatê Xwedayan tê hezkirin.  
Hêvîdar im ku temenê te bi xêr û xweşî derbas bibe.  
Hêvîdar im ku temenê te mîna çemekî dirêj be.  
Hêvîdar im ku temenê te mîna riya Xwedayan rohnî be.  
Min wexta gotinên Nûvanza bihîstin hundirê min xweş bû,  
dilê min fireh bû.  
Û min ji wî bawer kir.  
Min ji wî û Xwedayan bawer kir.  
Û Nûvanza bazinê ji duwanzdeh xelean da çêkirin.  
Û Nûvanza xeleka yekê da min.  
Û Nûvanza xelekên din bir bajarên din.  
Û her xelekek li bajarekî veşart.  
Û me şevên xwe bi sebrê,  
me rojên xwe bi sebrê,  
me evîna xwe bi sebrê havên kir û em bendewar bûn.

Û wexta em bendewar bûn, melîkan xwe ji şer re amade kir.  
Û wexta em bendewar bûn,  
Mûvatallî û Hattûşîlî biryara şer dan.  
Ramses biryara şer da.  
Û Mûvatallî biryar da ji bo em ji paytexta xwe Hattûşayê,  
bar bikin welatê Tarhandûşaya li piştta çiyân.  
Û bavê min ê esilzade Marûvaş û evîna min a esilzade Nûvanza  
û tevî min, me bar kir Tarhûndaşaya li piştta çiyân.  
Û min bajarê zarokatiya xwe Hattûşa terikand.  
Û min bar kir welatekî hîç nas nedikir Tarhandûşayê.

Û amadekariyên şer dewam kirin.  
Û ji kanan hînê zêdetir hesin hat derxistin.  
Û hostekaran hînê zêdetir tîr û kevan çêkirin.  
Û hostekaran hînê zêdetir şûr û bivir çêkirin.

Û xeratan bi sedan erebeyên şer çêkirin.  
Û ji welêt bi hezaran hesp hatin berhevkin.  
Û ji welêt bi hezaran şervan hatin komkin.  
Û wexta ew zivistan bi dawî bû, jinên li welêt xemgîn bûn.  
Û wexta ew zivistan bi dawî bû, kal û pîrên welêt xemgîn bûn.  
Û wexta ew zivistan bi dawî bû, xortên welêt bi tirs, wêrek  
û heyecan bûn.  
Û wexta ew zivistan bi dawî bû,  
Û wexta ew buhar hat, ez ji bo Nûvanza bi fikar bûm.  
Wexta berf diheliya, kulîlk vedibûn, zad digihîştin,  
ez ji bo Nûvanza bi fikar bûm.  
Lê Nûvanza rehet bû.

Nûvanza ji min re behsa kehaneta Xwedayan kir.  
Nûvanza bi bîra min xist ku şer jî hebe, veqetîn jî hebe,  
mirin jî hebe, kehanet ê bi cih bê.  
Ya diviyabû em bikin tenê bendewarî bû.  
Û em li bendê man.

Û wexta berf heliya û wexta kulîlkan vekir û wexta zevî  
şîn bûn,  
esker daketin jêr, destpêkirin daketin welatê Sûriyê.  
Buhara li welatê xwe berdand,  
ji bo mirin û kuştinê, destpêkirin daketin welatê Sûriyê.  
Û min û Nûvanza şevê xatir ji hev xwest.  
Û me şevê,  
tenê bi çavên xwe dest da hevdu û xatir ji hevdu xwest.  
tenê me bi gotinên xwe dest dan bedenên hevdu û xatir  
ji hevdu xwest.  
Ji ber ku destdana hevdu qedexê bû.  
Ji ber ku Xweda hêrs bûbûn.  
Ji ber ku Xwedayan qedexekiribû.  
Ji bo me dest bidaya hevdu diviya bû, em bendewar bûna.  
Û em bendewar bûn.

Mûvatallî û eskerên xwe çûn Qadeşê.  
Nûvanza û eskerên xwe çûn Qadeşê.  
Hattûşîlî û eskerên xwe çûn Qadeşê.  
Li wir, şûr, tîr û kevan,  
erebeyên şer û rimên Ramses li benda wan bûn.  
Li wir mirin li benda wan bû.  
Û ez her roj mirim, wexta Nûvanza li Qadeşê bû.  
Û her roj tîr li dilê min ketin.  
Û her roj şûr di bedena min re bûn.  
Û ez her roj di bin erebeyên şer de mam.  
Û rojekê ez mirim, wexta Nûvanza li Qadeşê bû.  
Û hemû jinên li welêt fena min bûn.  
Mîna min her roj mirin.  
Mirin, lê hêviyên wan neşikestîn.  
Hemû ji şer li benda nûçeyekê bûn.  
Ne kula kesî bû ku wê kê di şer de bi serkeve,  
kul û meraqa wan mêr, kur û birayê wan bûn,  
gelo wê sax vegeyana.

Û pir derbas nebû nûçe hatin.  
 Û wexta destpê kir nûçe hatin,  
 ji her malê dengê şînekê bilind bû.  
 Ji her malekê miriyek,  
 ji her malekê şervanek.  
 Û li her malê jineke şînî û reşgirêdayî,  
 û her mal û bajar bi êş, şîn û kederê xeriqî.  
 Û wexta encama şer hatibû eşkerekirin,  
 ne em û ne jî Misrî bi serketibûn.  
 Nûçegîhanê hatibû got:  
 Meydana şer a li Qadeşê pir qelebalix bû.  
 Li Qadeşê ezman sayî û vekirîbû,  
 ji bo Xwedayan karîbûya şer baş bidîta.  
 Yên me kemîn danîn pêşiya yekîneyên Misriyan.  
 Jixwe bi giştî çar lekên Misriyan hebûn.  
 Lê her çar lek ji hev qetiyabûn.  
 Yên me êrîş birin ser yek ji çar lekên Ra'yê.  
 Pêşî Ra, paşê leka Amonê li cihê cih hatin qedandin.  
 Ramses bû qurbanê bêtecrubetiya xwe.  
 Yên me du lekên Misriyan parçe kirin,  
 mîna çiyayekî ji navê ve biqelêşin.  
 Misrî perîşan bûn, li ber erebeyên me yên şer,  
 bivirên me û şûrên me yên şer.  
 Lê Kaşgayiyên di nava refên me de şer dikirin,  
 bawerkirin ku şer qediyaye.  
 Kaşgayiyan baregeha yekîneyeke Misriyan talan kir.  
 Pergala şer belavkirin berî ku şer bi dawî bibe.  
 Bi vî awayî, lekeke Misrî karîbû bi dizî, ji paş ve nêzîk bibe.  
 Bi vî awayî, serketineke vebirî ji destên me çû.  
 Bi vî awayî, me serketin bi Ramsesê têkbirî re parve kir.  
 Lê dîsa jî encameke xirab nebû.  
 Ramses roja din derneket meydanê.  
 Û xwe vekişand welatê xwe.  
 xwe vekişand, Sûrî ji şûr û bivirên me re berda.


Lê belê jinan guh nedida van nûçeyan.  
 Wan li mêr, zarok û birayên xwe pirsî.  
 Nûçegîhan nikarîbû nûçeyeke baş bide wan.  
 Nûçegîhan got:  
 Ez nizanim.  
 Nûçegîhan got:  
 Gelek mirî hebûne li meydanê.  
 Got:  
 Ez nizanim kî mir, kî ma?  
 Jin bi nûçegîhan re xeyidîn.  
 Tevî jinan ez jî xeyidîm.  
 Min got:  
 Tu Nûvanza nas dikî?  
 Nûvanza femandarekî mêrxas e.  
 Min got:  
 Eger tu Nûvanza nas nakî, çawa nûçeyên rast tîni?  
 Nûvanza ku şêrek e li herî pêşî şer dike.  
 Nûçegîhan ji min tirsîya.  
 Nûçegîhan ji jinan tirsîya.  
 Nûçegîhan xwe li pişt du parêzvanan veşart û ji meydanê  
 reviya.  
 Em jin li meydanê man.  
 Em bi êşa xwe ya ji bo mêr, zarok û birayên xwe man.

Û paşê esker hatin.  
 Esker sax salim hatin.  
 Esker birîndar hatin.  
 Eskerên çavên xwe, mil û lingên xwe wendakirî hatin.  
 Paşê kes nehat.  
 Paşê ji yên nehatî hevî hat birrîn.  
 Paşê ji bo yên nehatî her jin, mal û bajar giriya.  
 Lê ez hevîdar bûm.  
 Min digot eger tiştekî xirab bi serê Nûvanza hatibûya,  
 wê ji sedî sed bihata bihîstin.

Ji sedî sed wê bihata zanîn.  
Û ez li bendê bûm, ji bo careke din Nûvanza bibînim.  
Çavên min li deriyên bajêr bûn.  
Guhê min li nûçeyan bû.  
Ez li benda ketina Nûvanza ya bajêr bûm.  
Lê Nûvanza nehat.  
Nûvanza venegeriya welatê Hattiyê.  
Ez bi tenêbûna xwe re mam,  
ez bi tena serê xwe mam,  
ez mam bi hêviya xwe ya ji min hatibû stendin.

# KEVALA YANZDEHMÎN





Ho! Ew kesê dît hêviyên min şikestin,  
ho! Ew kesê min hîç nexwest hêviyên wî bişkên,  
wê şevê bavê min Marûvaş nûçe anî.  
Wê şevê bavê min di wexteke germ de ku bêhn li mirov  
diçikand got:  
Nûvanza di şer de wenda bûye.  
Got:  
Netirse, kesî nedîtiye ew miriye.  
Got:  
Netirse, kesî nedîtiye birîndar bûye.  
Got:  
Piştî şerê dawî kesî ew nedîtiye.  
Got:  
Belkî êsîr ketibe destê Ramses.  
Belkî Ramses ew bi xwe re biribe Misrê.  
Got:  
Bisekine, nerijîne rondikên çavên xwe.

Got:

Fikaran neke, şer qediya.

Fikaran neke, di demeke nêz de hevdîtin wê dest pê bikin.

Di destê me de jî esilzadeyên Misrê êsîr hene.

Em ê wan bi Nûvanza biguherin.

Wexta min gotinên bavê xwe bihîstin, min serî rakir li ber Xwedayan.

Min got, we sozên xwe ji bîr kirin.

Min got, ma hûn bi me dilîzin.

Min got, ma hûn ê vê laneta xwe tim li ser me bihêlin.

Û mîna Xwedaya Firtonê hêrsa xwe bide ser darekê,  
va ye, ez jî wisa mîna darê hejiyam li cihê lê sekinîbûm.

Ber çavên min reş bû, mîna êvaran tarî zû bikeve erdê.

Ez ketim erdê mîna kat û terhekî teze yê ji qurmê xwe bikeve.

Bavê min ez rakirim.

Bavê min ez birim nav nivînan.

Bavê min bi gotinên xwe yên dilxweşker xistim xewê.

Diyar bû pêderxistiye, Nûvanza hat xewna min.

Ji min re got:

Ev çi halê te ye?

Ji min re got:

Ma tu kehanetê nizanî?

Ji min re got:

Bendewar be. Biyanîyê em li bendê ne wê me bigihîne hevdu.

Û wexta min Nûvanza dît,

wexta min gotinên wî bihîstin,

ez bûm ku mîna bi rastî min ew dîtibe.

Ez bûm ku mîna bi rastî pêre peyivîbim.

Û roja din ji kêfxweşiyê ez ji nav nivînan derketim.

Û ez bendewar bûm.

Ez bendewar bûm, şevên dirêj, tevahiya rojên dirêj,

biharên şên, havînên têrtijî,

payîzên westiyayî, tevahiya zivistanên dijwar,

salên gelek dûrûdirêj.

Li ser van erdan çend şer qewimîn, çend talan,  
çend şah û keya li ser text rûniştin,  
çend şahan nikarîbûn hukim bikin,  
çend mirov mirin, çend mirov hatin dinê,  
çend îxanet, çend eşq,  
çend roşan, çend ayîn,  
çend bender rabûn, çend dawet çêbûn.  
Ez bendewar bûm.

Melîk Mûvatallî mir, ez bendewar bûm.  
Kurê wî Ûrhî Teşûp mir, ez bendewar bûm.  
Hattûşîlî bi dekûdolaban Ûrhî Teşûp ji welat qewitand, ez  
bendewar bûm.  
Hattûşîlî di dawîya dawî de gihîşt xweziya xwe,  
ez bendewar bûm.  
Hattûşîlî bû melîk, ez bendewar bûm.  
Paytext dîsa birin Hattûşayê, ez bendewar bûm.  
Pûdûhepa bû melîke, ez bendewar bûm.  
Pûdûhepa, ji Ramses re name şand, li Nûvanza pirsî.  
Di nameya dûvdirêj de tenê bi xetekê li Nûvanza pirsî.  
Tenê bi xetekê pirsî, lê ez hêvîdar bûm, ez bendewar bûm.  
Ji Misrê piştî mehan name hat.  
Ez li ber çongê Melîkeyê li ser totikên xwe rûniştim.  
Min bi hêvî, li nameyê guhdarî kir.  
Ramses weha digot:  
Melîkeya welatê Hattiyê, Melîkeya Mezin Pûdûhepa,  
Ez birayê te, baş im.  
Malên min, zarokên min, artêşên min, hespên min, erebeyên  
min baş in.  
Li welêt bi piranî başî û qencî heye.  
Hêvîdarim xwişka min tu jî baş bî!  
Hêvîdarim, malên te, zarokên te, artêşên te, hespên te, ere-  
beyên te jî baş bin.  
Esilzadeyên te baş bin!

Li piraniya welatê te başî û qencî hebe.  
 Saloxdarên min, tevî nûçegîhanên xwişka min hatin cem min.  
 Wan ji min re ragihandin,  
 Melîkeya Mezin, Melîkeya Hattiyê xwişka min baş e.  
 Wan ji min re,  
 başiya xwişka min,  
 başiya zarokên xwişka min,  
 qenciya li welatê wan ragihandin.  
 Min wexta nûçeyên xweş yê xwişka xwe girtin  
 kêfxweş bûm.  
 Ê min weha got:  
 Mala Xwedê ava baş in.  
 Min nameya xwişka min ji min re şandibû dît  
 û min dabaşên xwişka min Melîkeya Mezin a Hattiyê pir baş  
 anîbûn ziman bihîstin.  
 Birayê min Melîkê Mezin ê Hattiyê, Melîkê Mezin ji min re  
 weha nivîsand:  
 Ew kesên wê rûnê bi misk û enber li serê keça min bireşînin  
 bişîne.  
 Ew bila wê bibin mala melîkê mezin!  
 Ha birayê min ji min re welê nivîsî.  
 Ev biryara birayê min ji min re ragihandiye xweş e.  
 Xwedayên Misrê û Xwedayên Hattiyê  
 ji bo em her du welatên mezin heta hetayê bikin yek  
 em gîhandin biryareke bi vî rengî.

Welê digot Ramsesê mezin.  
 Ramsesê Mezin behsa karûbarên mezin dikir.  
 Lê hema xetekê bi tenê jî behsa Nûvanzayê nedikir.  
 Lê min hêviya xwe wenda nekir, ez bendewar bûm.  
 Bavê min Marûvaşê esilzade mir.  
 Bavê min Marûvaşê esilzade neviyê xwe nedît mir, ez bende-  
 war bûm.  
 Welatê min bi Misrê re peymanî dostaniyê mohr kir,  
 ez bendewar bûm.

Melîk Hattûşîlî û Fîrewn Ramses peymanî dostaniyê li ser  
heft kevalên cihê kolan, ez bendewar bûm.

Hattûşîlî ji Ramses re got birayê min.

Ez fikirîm ku xwezî beriya şer ji hev re bigotana bira û ez  
bendewar mam.

Ez fikirîm ku ma heyf nebû esker mirin û ez bendewar mam.

Ez fikirîm ku ma dayik, zarok û jinên eskerên mirî ne gune  
bûn û ez bendewar mam.

Min got; ma neheyfa min e,

ma neheyfa Nûvanza ye û ez giriyam û ez bendewar mam.

Ez bi Xwedayê Rojê yê Ezmên, Xwedawenda Rojê ya Arînayê  
û Nûvanza bawer bûm û bendewar mam.

Û wexta ez bendewar mam, ji bo biyaniyê wê me ji lanetê xi-  
las bike bixwîne, min ev keval dan nivîsandin.

Ez bendewar mam û pîr bûm.

Di çongên min de hêz nema,

porê min mîna ewrên bi keder gewr bûn,

çermê min qermiçî, rohnîya çavên min zelûl bû,

lê ez bendewar mam.

Gotinên bidim nivîsandin qediyam û bendewar mam.

Min hêviya xwe wenda nekir,

lê baweriya min hinekî kêr bû.

Wexta baweriya min hinekî kêr bû

Nûvanza xwe nîşanî min da.

Mîna Xwedayekî xwe di xewnê de nîşanî min da.

Hêviya min nû kir û got bendewar be. Û ez bendewar mam.

Ez niha pîr westiyayî me.

Niha sura bayê ya ji welatê miriyan tê bedena min sar dike.

Niha wexta min nema.

Lê ez dizanim bendewariya min neqediya.

Ez dizanim, bedenên me negihîjin hevdu jî çawa bibe

wê ruhên me bigihîjin hevdu.

# KEVALA DUWANZDEHMÎN





Ho! Biyanîyê ji demeke ji salan wêdetir tê.  
Ho! Ew kesê wê min bigihîne Nûvanza.  
Ho! Ew kesê wê Nûvanza ji min re bîne.  
Niha ji min re bibêje, bi rastî tu hatî?  
Gotinên min dane nivîsandin, te xwendin?  
Bi rastî, tu li duwanzdeh bazinên li duwanzdeh bajaran  
veşartî geriyayî?  
Tu çûyî duwanzdeh bajarên cuda?  
Te duwanzdeh xelekên bazinan dîtî?  
Te duwanzdeh xelekên bazinan ji bo me bigihîne hevdu  
berhev kirin?  
Tu yê Nûvanza ji min re bînî?

Naxwe Xwedayan dîsa em xapandin?  
Naxwe Nûvanza bê sedem duwanzdeh bazin dan çêkirin,  
Naxwe Nûvanza bê sedem ew veşartin li duwanzdeh bajaran,  
Naxwe tu, biyanî, naxwe tu tineyî?  
Naxwe bendewariya min tewş bû?  
Naxwe emrê min tewş derbas bû?  
Naxwe min min tewş ji Nûvanza hez kir?  
Naxwe min...

## Maneya hiyeroglîfên di pirtûkê de

Ez	
Evîndar	
Xwedaya Firtonê ya Ezmên	
Jiyan	
Çiyayê Pîroz	
Zar û Zêç	
Xwedayê Rojê	
Zarok, Keçik	
Melîkeya Mezin	
Pevçûn	
Melîk	

## Hin navên di pirtûkê de di derbas dibin

### **Hattî:**

Qewmek e, BZ di navbera salên 2500-1700'î de li Anatolyayê şaristaniyeke mezin ava kiriye. Hîtîtiyên paşê hatine herêmê ji aliyê şaristani û baweriyê/mîtolojiyê ve gelekî ketine bin bandora Hattîyan.

### **Hîtî:**

Yekemîn dewlet e, BZ ji salên 2000î ta sedsala VIII. BZ li Anatolyayê hukim kiriye.

### **Hattûşa:**

Paytexta Împaratoriya Hîtîtan e. 5 km nêzî navçeya Çorimê Sûngûrliyê ye, li Bogazkoyê dikeve.

### **Tarhûndaşa:**

Bajarek e, di dema şerê Qadeşê de ji bo demekê ji Hîtîtiyan re paytextî kiriye.

### **Meclîsa Pankûyan:**

Di dema Hîtîtan de meclîsek e, hem qanûnan derdixîne û hem jî dadgeriyê dimeşîne.

### **Qadeş:**

Li Sûriya kevn bajarek e.

### **Şerê Qadeşê:**

Li rûyê erdê yekemîn şerê mezin e ku BZ di sala 1290'î de qewimiye. Ji ber ku li nêzî bajarê Qadeşê qewimiye bi vî navî tê hildan.

### **Nînatta:**

Jinek e, ji malbateke esilzade ya Hîtîtiyan tê.

### **Marûvaş:**

Bavê Nînattayê.

### **Nûvanza:**

Zilamê Nînattayê jê hez kiriye. Fermandarê Hîtîtiyan.

### **Mannî:**

Jina Nûvanza.

### **Zîtîş:**

Zarokê Nûvanza û Manniyê.

### **Înara:**

Hevalê Nînatta yê zarokatiyê. Ciwanê ji Nînattayê hez kir.

**Zûvappîş:**

Bavê Înara.

**Melîk Mûvatallî:**

Melîkê Hîtîtiyan Mûvatalliyê duyemîn. Ji 20 salan zêdetir hukim kiriye.

**Ûrhî Teşûp:**

Kurê Mûvatalliyê duyemîn. Ji aliyê apê xwe Hattûşîliyê sêyemîn ve ji text hatiye xistin.

**Melîk Hattûşîlî:**

Hattûşîlî yê sêyemîn. Birayê Mûvatalliyê duyemîn. Yek ji melîkên mezin û bi hêrs ê Hîtîtiyan.

**Melîke Pûdûhepa:**

Jina Hattûşîlî yê sêyemîn. Di dewleta Hîtîtiyan de yek ji melîkeyên bi tesîr.

**Ramses:**

Fîrewnê Misrê Ramsesê Duyemîn. Di şerê Qadeşê de fermandarê artêşên Misrê.

**Melîk Telîpînû:**

Melîkê Hîtîtiyan. Ji bo kuştinên di nava qesrê de bi dawî bike, bi navê xwe fermannameyek derxistiye.

**Melîk Şûppîlûlûma:**

Yek ji melîkên girîng ên Hîtîtiyan. Erdên welat fireh kirine û dewleteke bi hêz ava kiriye.

**Zannanza:**

Kurê Şûppîlûlûma yê ji aliyê Misriyan ve hatiye kuştin.

**Tûtenkamon:**

Fîrewnekî Misrê ye, ku bi dekûdolabên nava qesrê hatiye kuştin.

**Ankesenamon:**

Melîkeya Misrê, jina Tûtenkamon.

**Serkeşe Eje:**

Di dema Misra kevin de serkeşeyek e, dizane dekûdolaban bigerîne.

\*\*\*

**Ahmet Umît:** di sala 1960'î de li Dîlokê hat dinê. Di sala 1983'an de Zanîngeha Marmarayê Beşê Rêveberiya Gelemperiyê qedand. Di navbera salên 1985-1986an de li Akademiya Zanistên Civakî ya Moskovê ders dît.

Ahmet Umît di sala 1960'î de li Dîlokê hat dinê. Di sala 1983'an de Zanîngeha Marmarayê Beşê Rêveberiya Gelempiriyê qedand. Di navbera salên 1985-1986an de li Akademiya Zanistên Civakî ya Moskovê ders dîtîn.



## DESTANEKE HÎTÎTIYAN

*Li Anatoliyê yekemîn dewleta mezin: Hîtîti.  
Li rûyê erdê yekemîn şerê mezin: Qadeş.  
Jineke Hîtîti ya 3300 salan  
li benda evîndarê xwe: Nînatta.  
Evîneke nivcomayî: Nînatta û Nûvanza...*

